

# Gelo Klasîkên Edebîyata Kurdî Hene?

Abdurrahman Adak<sup>1</sup>

## 1. Destpêk

Di tarîxa şaristanîyên cîhanê de hin berhemên girîng, karîger û navdar ên hizrî, zanistî û hunerî hene ku ji malê miletekî û çandekê wêdetir malê cîhanê tevî ne. Ev berhêmên ku di esasê xwe de ji nav edebîyateke millî derdikevin bi rêya danûstandinên sîyasî, civakî û edebî li nav milletên cîran ên parzemînî û şaristanîyên di yên cîhanî belav dibin. Bi vî rengî ew berhem ne tenê xîtabî axêferên zimanê berhemê dikin, di heman demê de xîtabî şaristanîyên parzemînî û cîhanê jî dikin. Berhemên bi vî rengî ne berhemên ji rêzê ne û bi mebesta ku ji berhemên di bên cudakirin bi hin navên taybet tên binavkirin ku di serî de têgeha “klasîk”ê tê. Dikare bê gotin ku “klasîk”a ku têgeheke Rojavayî ye (bi îmlaya orjînal: classique yan ji classic) di roja me de li nav hemû milletên cîhanê bi vî wateya xwe tê bikaranîn. Lêbelê li nav hin milletan hin têgehên di yên ku li kêleka wê bi heman wateyê tên bikaranîn jî hene. Bo nimûne peyva şaheserê hem li nav Farisan hem jî li nav Kurd û Tirkan, peyva şahkarê li nav Farisan û peyva şakarê jî li nav Kurdan wek hemwateyên klasîkê tên bikaranîn.

Bêguman klasîkên hemû milletan di heman pileyê de li cîhanê belav nebûne û pilebendîya nasyarîya wan jî ne wek hev e. Di dinyaya me ya îroyîn ya global de hevterîbê hêza şaristanîya Rojavayê dema “berhemên klasîk”, bi taybetî jî “klasîkên edebîyatê” tê gotin pêşî ji şaristanîya Rojavayê hin berhemên tîpîkî mirovî. *Îlyada* û *Odyseiyaya* Homeros (Yewnanî), *Komedyaya Îlahî* ya Dante (Îtalyanî), *Romeo û Julieta* Shakespeare (Îngilîzî) û *Fausta* Goethe (Almanî) ji bo vî diyardeyê wek nimûne dikarin bînin dayîn. Bêguman kesên ku bi edebîyatê re mijûl in dê ji edebîyata Latînî *Aeneasa* Virgilius, ji ya Fransî ceribînên Montaig-

1 - Prof. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî, abdurrahmanadak@gmail.com.

ne, ji ya Erebi dîwana el-Mutenebbî (k.d. 965), ji ya Farisî dîwana Hafizê Şîrazî, ji ya Tirkî dîwana Fuzûlî, ji ya Hindê *Kelîle û Dimneya* Beydaba û gelek berhemên di bijimêrin.

Divê bê gotin ku li jorê ji edebîyatên cîhanê xişteyêke nimûneyî û temsîlî ya klasîkên cîhanê hatiye dayîn û dibe ku hin ji van berheman di çavên hin pisporan de wek klasîkeke cîhanê neyên qebûlkin ku ev di çarçoveya mijara klasîkan de tiştekî asayî ye. Lêbelê ya girîng ew e ku di roja me de têgeha klasîkên cîhanê têgeheke bingehîn a edebîyata cîhanê ye û mijareke bingehîn a disiplîna edebîyata berwaridî ye. Ev berhem di nav bazareke cîhanî de cih bigirin jî jêdera wan a esasî ziman, edebîyat û çanda miletekî ye. Tu guman tune ye ku ev berhemên klasîk û danerên wan li cîhanê şaristanîya milletên xwe temsîl dikin û bivênevê di nav wê bazarê de îtibarekê jî bexşî milletê xwe dikin.

Li vê derê di çarçoveya armanca vê vekolînê de em ê werin ser edebîyata Kurdî û bi çendîn pirsîyaran dest bi mijarê bikin: Gelo di edebîyata Kurdî ya xwedî rabirdûyêke dirêj de ku ev rabirdû ji ya piraniya milletên jorîn ne dirêjtir be ne kêmtir e jî, berhemeke ku di asta cîhanî de payeya klasîkê heq bike tune ye? Eger ev tunebe gelo di nav şakarên edebîyata Îslamî ya Rojhilatê de jî berhemeke edebîyata Kurdî cih nagire? Eger ev jî nebe gelo di çarçoveya edebîyata Kurdî bixwe de amadekirina xişteyêke pêşnumayî ya klasîkên edebîyata Kurdî ne pêkan e? Yan gelo ji vê yekê re jî hêj gelekî wext maye?

Bi bawerîya me tiştekî gelekî asayî ye ku mirov li ser vê babetê bifikire, potansiyela edebîyata Kurdî destnîşan bike, aliyên erênî û nerênî derxe meydanê, edebîyata Kurdî bi edebîyatên cîhanê yên xwedî klasîk re muqayese bike û di vê mijarê de bîr û baweriyên xwe parve bike. Dema mirov bîna bîra xwe nîqaşên li ser babeta klasîkên cîhanê û yên edebîyata Tirkî hêj di sala 1897an de ketine rojêve dewrûberên edebîyata Osmanî dê baştir bê fêmkirin ku di çarçoveya edebîyata Kurdî de jî rawestana li ser vê mijarê tiştekî girîng e û gelekî bimefa ye. Di esasê xwe de edebîyateke ku di rabirdûya wê de tarîxeke edebîyatê hebe dê klasîkên xwe jî hebe û eger mijara klasîkên edebîyata Kurdî ya ku xwedî tarîxeke kevin e neyê rojevê ev bixwe kêmasîyêke mezin e.

Hêjayî gotinê ye ku li nav Kurdan li ser vê mijarê hin nivîskar û rewşenbîrên ku hizrên xwe îfade kirine hene. Bi taybetî Celadet Alî Bedirxan di sala 1941ê de di Kovara Hawarê de bi sernavê “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” de nivîsarek nivîsîye û li gor tesbîtên me bi taybetî li nav Kurdên Bakur û Rojava kesê ku cara pêşî ev mijar bi nav kirîye Celadet Alî Bedirxan e. Bedirxan di vê nivîsara xwe de têgeha klasîkê pênase kirîye lêbelê li şûna ku nivîskar yan berhemên Kurdî yên ku dikevin kategorîya wê pênaseyê tesbît bike di çarçoveya zanebûna wê serdemê de hemû nivîskarên ku di çarçoveya edebîyata klasîk de

bi Kurdî berhem dane dane nasandin û tesbît û tesnîfa klasîkên Kurdî hiştîye bi hêvîya vekolerên piştî xwe. Di vê vekolînê de em dixwazin hewldana Celadet Berdirxan a di vê babetê de bi bîr bixin, ji cihê ku ew lê maye gaveke bi pêş ve bavêjin û piştî wî bi heştê salî (1941-2021) careke dî mijara klasîkan bixin rojeva dewrûberên edebîyata Kurdî.

Herçiqas hemû klasîk ne aîdê serdemên kevin in di çarçoveya edebîyata modern de jî li ser klasîkan dikare bê rawestan jî ji ber ku pêwendîyeke xurt a têgeha klasîkê bi rabirdûyê re heye tişekî asayî ye ku berî her tiştî mirov ji klasîkên ku bûne malê tarîxê dest bi mijarê bike. Ji ber vê yekê jî sînorenê ve vekolînê tenê de çarçoveya edebîyata Kurdî ya klasîk de be ku Celadet bixwe jî wisa kirîye.

Ji bo ku mirov bikare behsa klasîkên edebîyata Kurdî bike wek gava yekem divê mirov ji terma “klasîk”ê dest bi mijarê bike ku termeke aîdê şaristanîya Rojavayê ye û ji wê derê derbasî edebiyatên di yên cîhanê bûye. Lêbelê piştî vê gavê gava duyem dîsa dê ne babeta me ya esasî be. Lewra berî wê divê mirov ji aliyê klasîkan ve bi taybetî li edebiyatên Erebi, Farisî û Tirkî temaşe bike ku bi edebîyata Kurdî re di heman hewzeya edebî de (edebîyata Îslamî ya Rojhilatê) cih digirin. Piştî vê yekê mirov êdî dikare di çarçoveya krîterên Rojavayî ên ku berhemekê dixin klasîk û muqayeseya klasîkên edebîyata Îslamî de li ser babeta klasîkên edebîyata Kurdî analîzên xwe bike. Loma em ê di vekolînê de pêşî seyra tarîxî ya pênaseyên klasîkê û krîterên wê pêşkêş bikin, piştî li rewşa klasîkên Îslamî binêrin û herî dawî li ser van esasan derbasî mijara “klasîk”ên edebîyata Kurdî bibin. Li vê derê em ê li ser rabirdûya mijara klasîkê li nav Kurdan û bi taybetî jî wek pêşengekî ve mijarê li ser nivîsara Celadet Alî Bedirxan ya ku di vê biwarê de nivîsiye (Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin) rawestin, hebûna klasîkên Kurdî nîqaş bikin, xişteyeke pêşnumayî ya klasîkên bingehîn ên edebîyata Kurdî pêşkêşî dewrûberên edebîyata Kurdî bikin û herî dawî ji bo nasandina klasîkên Kurdî nexşerêyekê xêz bikin.

## 2. Têgeha Klasîkê

Herçiqas klasîk têgeheke vegir a Rojavayî ye ku ne tenê di hunera edebiyatê de di heman demê de ji hunerên bedew bi taybetî di peyker, avahîsazî û mûsiqiyê de tê bikaranîn jî<sup>2</sup> di vekolînê de em ê ji aliyê hunera edebiyatê ve li ser têgehê rawestin. Dema em li seyra tarîxî ya geşedana têgeha klasîkê dinêrin em dibînin ku ne bi heman peyvê be jî di serdema antîk a Grekê de (teqribî BZ500-PZ320) di biwara klasîkê de têgihîştinek heye. Di vê serdemê de li Atînayê berhemên hunerî bi dustûra “bedewîya bipîvan” hatine sazîkirin ku ev taybetîya sereke ya klasîkên

2 - Selçuk Mülayim, “Antikten bugüne Klasik Anlayışları”, Sanat ve Klasik, Klasik İst. 2006, r. 6.



wê serdemê ye. Di wê serdemê de têgeha “kanon”ê ku tê wateya pîvan û dustûrê di heman demê de klasîkê jî îfade dike.<sup>3</sup> Wek têgeh bikaranîna peyva “klasîk”ê aîdê serdema împeratorîya Romaya antîk e (teqrîbî sedsal I-III). “Klasîk” di zimanê Latînî de yan ji “classise”ê tê ku wateya wê yekîneya keştîyan e, yan jî ji “classicus” tê ku wateya wê çîn e. Cara yekem nivîskarê Romayî Aulu-Gelle/ Aulus Gellius/ (k.d. 180) di sedsala duyem a zayînî de “classicus assiduusque scriptor” bi maneya nivîskarê xwedî nirx, navdar, maldar û ji xelkê dûr<sup>4</sup>; “scriptor classicus” bi wateya nivîsên çîna bilind û “proletarius scriptor” jî bi wateya nivîsên çîna proleter bi kar anîye ku di wê demê de civak ji şeş çînan pêk dihat.<sup>5</sup> Bi vî awayî di wê serdemê de edebîyata ku ji destê çîna herî bilind derketiye wek klasîk hatîye binavkirin. Di vê serdemê de têgihîştina klasîkê li ser esasê klasîzma Grekê ava dibe.<sup>6</sup> Romayîyan edebîyata Grekê wek klasîkên xwe qebûl kirine û hewl dane ku li pey şopa wan biçin. Di heman demê de Cicero û Vergiliusê ku edebîyatvanên girîng ên serdema zêrîn a edebîyata Romayê ne ji aliyê peyrewên xwe ve wek klasîkên Romayê hatine qebûlkirin.

Di edebîyata Latînî ya serdema navîn de -ji qebûlkirina dewleta Romayê ya Mesîhîtiyê (teqrîbî sedsal IV) heta bi hatina serdema Ronansa edebî (teqrîbî sedsal XV)- ji têgihîştina klasîzma serdemên antîk ên Grek û Romayê dûrketinek çêbûye û ji aliyê pîvan û zewqa edebî ve edebîyateke lawaz derketiye meydanê. Bi hatina Ronansê re hem dawî li serdestiya Latînî hatîye hem jî têgihîştina klasîzma serdemên antîk ji nû ve hatîye vejandin. Di vê serdemê de zimanên Ewropayê yên wek Îtalî, Frensî, Îspanî, Îngilîzî û Almanî digel vê têgihîştinê wek zimanên millî û edebî avabûna xwe temam kirine û klasîkên xwe derxistine meydanê.<sup>7</sup> Li ser vê paşxanê di sedsala XVIIem de li Frensayê bizaveke edebî ya bi navê klasîzmê ava bûye ku nûnerên vê bizavê nivîskarên serdema klasîk a Grek û Romayê şopandine û estetîka berhemên wan model wergirtine. Ji bo vê jî nivîskarên klasîk ên sedsala XVIIem bi xwendin û tercumekirina berhemên serdema klasîk xwe perwerde kirine.<sup>8</sup> Di vê serdemê de li Ewropayê berhemên ku di polan de ji bo fêrkirina zimanên Yewnanî û Latînî hatine bikaranîn wek “klasîk” hatine binavkirin.<sup>9</sup> Ji vê serdemê şûnde têgeha “klasîk”ê ji bo berhemên Grek û Romaya antîk hatîye bikaranîn û serdemên ku ev berhem tê da hatîne dayîn jî wek “serdema klasîk” hatîye binavkirin. Çawa ku di “Encyclopaedia Britannica”yê de jî

3 - Mülayim, g.n., r. 4-5.

4 - Sainte Beuve, “Klasik Nedir”, *Pazartesi Konuşmaları I*, (wer. Fehmi Baldaş), MEB Yayınları, çapa duyem, İstanbul 1990, r. 316.

5 - Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, Dezgay Wergêran, Hewlêr 2006, r. 15; Hêvî Berwarî, *Rêbazên Edebî*, Weşanên Êketiya Nivîserên Kurd (çapa yekem), Dihok 2010, r. 82.

6 - Mülayim, g.n., r. 4.

7 - Beuve, g.n., r. 316-317.

8 - Emel Kefeli, *Batî Edebîyatında Akımlar*, (çapa sêyem), Dergah, İstanbul 2017, r. 25-30.

9 - Kefeli, b.n., r. 25.

tê îfadekirin berhemên klasîk ên serdema klasîk bingeha edebiyata Rojavayê ne û ji bo wê di asta destpêkê de ne.<sup>10</sup> Çawa tê dîtin “klasîk” xwedî seyreke tarîxî ya dûrûdirêj e ku ji klasîzma Grekê dest pê dike, ji wê derê digihîje Romaya antîk, ji wê derê xwe di ser serdema navîn re çengî klasîzma Ewropî dike û ji wê derê jî diherike roja me.

Heta bi vê derê taybetmendiyên klasîkê di sê xalan de dikarin bîn xulasekirin: Hunera bipîvan, dêrînî û aîdiyeta çîneke bilind. Jixwe pênaseyên klasîk ên klasîkê her di vê çarçoveyê de hatine kirin. Li gor pênaseya ku rexnegirê Frensî Sainte Beuve di sala 1850î de kirîye klasîk, helbestvanekî kevin e ku ji berê ve teqdîra herkesî heq kirîye û pisporiya wî ya di qada wî de hatiye pesendkirin.<sup>11</sup> Di vê çarçoveyê de berhema klasîk jî wek berhemên resen û mukemmel ku çiqas zemanekî zêde di ser wan re derbas bibe jî tiştêkî ji nixê xwe winda nakin dikare bê pênasekirin. Çawa ku Hilmi Yavuz jî îfade dike pîvana herî baş a ku berhemekê dike klasîk mayîdebûna berhemê ya li hemberî zeman e. Loma berhemên ku ji sedsalên rabirdûyê gihîştine roja me berhemên klasîk in.<sup>12</sup>

Ji aliyekî dî ve piştî derketina bizava klasîzmê dustûrên vê bizavê jî -qet nebe ji aliyê endamên vê bizavê ve- di nav taybetîyan klasîkan de hatine rêzîkirin. Çawa tê zanîn di klasîzmê de dustûrên zemanê berê yên ku wê demê jî, îro jî û sibe jî tu carî naguherin esas in.<sup>13</sup> Loma di klasîzmê de têgihîştineke gerdûnî ya sitûnî heye ku hem zemanê berê hem jî paşerojê vedigire nav xwe. Hilmi Yavuz di vê çarçoveyê de berhemên klasîk wek berhemên ku di kîjan serdemê de bîn xwendin kêşe û problemên wê serdemê dibersivînin pênase dike û ji bo vê yekê balê dikişîne ser navê watedar a berhema Jan Kott (k.d. 2001) a ku di biwara şanoyên Shakespeareî de nivîsiye: *Shakespeare our Contemporary (Hevçaxê me Shakespeare)*.<sup>14</sup> Peter Brookê ku ji bo vê berhemê pêşgotinek nivîsiye hevterîbê navê berhemê şîroveyeke weha dike ku aliyê gerdûnî yê Shakespeareî gelekî xweş hatiye îfadekirin: “Jan Kott tam mirovekî serdema Elizabethê ye. Shakespeare hevçaxê Kott e. Kott jî hevçaxê Shakespeare e. Ew di biwara Shakespeare de rasterast û wek ku di wê serdemê de jîyaye ji zimanê yekem diaxife”<sup>15</sup> Ev perpektîf nîşan dide ku kesayetê klasîk ji heyama xwe tê heyama me û em jî ji heyama xwe diçin heyama wî. Ev gerdûnîbûna sitûnî jî wek taybetîyeke klasîkê derdikeve pêş.

10 - The Editors of Encyclopaedia Britannica, “Classical literature”, Encyclopaedia Britannica, <https://www.britannica.com/art/lyric> (21.03.2021).

11 - Beuve, g.n., r. 315.

12 - Hilmi Yavuz, “Bizim Klasiğimiz Var mı?”, *Denemeler*, Boyut yay., İstanbul 1996, r. 30.

13 - Kefeli, b.n., r. 25-30.

14 - Yavuz, g.n., r. 31.

15 - Peter Brook, “Pêşgotin”, *Jan Kott Çağdaşımız Shakespeare*, Mitos Boyut Yayınları, wer. Teoman Güney, İst. 1999, r. 8.

Gerdûnîbûna kesayetê klasîk/berhema klasîk ne tenê bi awayekî sitûnî ji zemanên berê heta bi roja me ye, ew di heman demê de bi awayekî asoyî di nav hemû milletên cîhanê de jî gerdûnî ye. Li gorî helbestvan û teorîseyenê edebîyatê T. S. Eliot (k.d. 1965) di berhema klasîk de şêwazeke hevpar a gerdûnî heye ku ev yek zêdetir ji aliyê naverok û hestên dînî yên hevpar ve xwe dide der. Ji ber ku Goethe behsa hin tiştên xwecihî û demkî yên Almanan dike ew nabe klasîkekî gerdûnî, ew tenê klasîkekî milletê Alman e û di çavê bîyanîyekî de şaristanîya Rojavayê tevî temsîl nake.<sup>16</sup> Berhema klasîk a gerdûnî ne aîdê miletekî tenê ye, ew aîdê milletên cîhanê tevî ye. Li gor ku Kaplan vediguheze A. Rivarol (k.d. 1801) derheqê vê mijarê de weha difikire: Berhemên ku miletek pê şanazî dike klasîkên wî milletî ne û berhemên ku hemû millet pê şanazî dikin klasîkên herkesî ne.<sup>17</sup> Loma dikare bê gotin ku eger berhemek çawa ku xîtabî axêferên zimanê xwe dike bi heman rengî xîtabî milletên bîyanî jî bike klasîkeke gerdûnî ye, eger xîtabî milletên bîyanî neke û tenê xîtabî axêferên zimanê xwe bike ew klasîkeke millî ye.

Li gor Encyclopaedia Britannicayê klasîk serdemeke edebî ya her zimanî destnîşan dike ku ew serdem bi berhemên edebî yên mukemmel û xwedî tesîreke mayînde derdikeve pêş. Di edebîyata Yewnana kevnar de maweya ku berî zayîne bi 500î dest pê dike û heta bi 320ê dewam dike serdemeke wisa ye. Serdema Zêrîn a Romayê berî zayîne bi 70yî dest pê kirîye û heta bi 18ê mîladî dom kirîye. Nîveka duyem a sedsala XVIIem ji bo edebîyata Frensî û maweya 1660-1714an jî ji bo ya Îngilîzî wek serdemên zêrîn ên klasîk tîne qebûl kirin.<sup>18</sup> Pênaseya Edmond Scherer (k.d. 1889) ya ku ji aliyê Kaplan ve tê veguhestin jî paralelî pênaseya Britannicayê ye: “Di tarîxa hemû milletan de ji aliyê ziman û hizrê ve serdemeke mezin a geşedanê heye ku berhemên vê serdemê klasîkên wî milletî ne.”<sup>19</sup> Eliot jî dibêje ku klasîk tenê di dewrên kemalê yên medenîyeteke û ziman û edebîyateke de dikarin derkevin meydanê û di dewra piştî Elizabeth (1558-1603)ê de daketina asta edebî ya şanoya Îngilîzî ji bo vê yekê nîşaneyek e.<sup>20</sup> Ehmed Midhed (k.d. 1912) jî bi şîroveyên xwe mijarê zêdetir zelal dike: “Heta zimanek negihîje dewra xwe ya kemalê bi wî zimanî berhemên klasîk nayên nivîsîn. Loma berhemên van dewran wek berhemên klasîk nayên qebûl kirin. Serdema Perikles (BZ.446-431) a Yewnanê û serdema Augustos (BZ. 27-PZ.14) a Romayê heq didin vê hizrê. Heman tişt bo edebîyatên Erebi û Farisî jî wisa ye. Piştî klasîkên ku di van serdeman de hatine dayîn klasîkên nû nehatine dayîn û ji wê wêdetir nehatine teqlîd kirin

16 - T. S. Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, wer. Sevim Kantarcıoğlu, Paradigma, İstanbul 2007, r. 171, 175-176.

17 - Ramazan Kaplan, *Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*, Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, Ankara 1998, r. 23-24.

18 - The Editors of Encyclopaedia Britannica, “Classical literature”, Encyclopaedia Britannica, <https://www.britannica.com/art/lyric> (21.03.2021).

19 - Kaplan, b.n., r. 23-24.

20 - Eliot, b.n., r. 159.



jî.”<sup>21</sup> Di encamê de derketina di serdemeke zêrîn a şaristanîyekê de wek taybetîyeke dî ya klasîkan derdikeve pêş. Serdemên bi vî rengî di jîyana miletan de guherîn û nûjenî ne. Di van serdeman de tiştên nû yên di jîyana miletan de berî her tiştî di zimanê wan de tê dîtin. Hizrên nû ku di encama vê guherîn û nûjenîyê de bi zimanekî nû tèn gotin klasîkan derdixin meydane. Danteyê ku zimanê Îtalî vejandîye ji bo vê diyardeyê nimûneyeke girîng e.<sup>22</sup>

Taybetîyeke dî ya klasîkê jî sazîrîna tradîsyoneke edebî ye. Di dawîya sedsala XVIIem de di çarçoveya bizava klasîzmê de li Ewropayê klasîk ji wê edebiyat û hunera bilind re dihat gotin ku hêjayî şopandin û teqlîdê bû.<sup>23</sup> Sainte Beuve tam di vê çarçoveyê de ji bo têgeha klasîkê tiştêkî daîmî û rûniştî ku di nav miletekî de bi awayekî yekpare bibe tradîsyon, hêdî hêdî ava bibe û bînavber ji nifşekê derbasî nifşa dî bibe pêwîst dibîne. Li gor wî nivîskarekî jêhatî çiqas xwedî zeka û muxeyyîleyeke awarte be jî eger bi carekê ronî bide û tu tesîrekê li pey xwe nîşan nede ew nabe klasîk.<sup>24</sup> Li gor Calvino ku rexnegirekî girîng ê edebîyatê ye sedsala me ye klasîk şopên xwendinên ku berî me hatine kirin hildigirin û rengvedanên xwe yên li ser çandên ku tê re derbas bûne digihînin me.<sup>25</sup> Bi awayekî siruştî tradîsyona edebî ya ku klasîk saz dike hem bi edebîyata millî hem jî bi edebîyatên cîhanê re pêwendîdar e. Klasîk bi vê mîrasa xwe pêşî di avakirina edebîyata millî de û piştî jî di avakirina edebîyata cîhanê de roleke girîng dilîzin.

Çawa tê dîtin heta bi vê derê hunera bi pîvan, dêrînîbûn, gerdûnîbûn, mayîndebûn, serdemeke zêrîn û avakirina tradîsyonekê wek taybetmendiyên berhema klasîk derdikevin pêş. Li vê derê bi armanca ku pirsên wek; “Gelo berhemek çawa dikare ji zemanên berê heta bi roja me mayînde bimîne?”, yan jî “Gelo berhemek çawa dikare van taybetîyan tevan hilgire?” bî bersivandin divê aliyê hunerî ye klasîkan bi taybetî bê dupatkin. Li gor me krîtera herî girîng ku van taybetîyan bexşî berhema edebî dikin aliyê wan ên edebî ye. Tu guman tune ye ku berhemên berê yên mayînde bi saya vî aliyê xwe ye edebî digihîjin roja me û tradîsyoneke edebî ava dikin. Tiştêkî pir asayî ye ku berhema edebî bi qasî hêza xwe ya edebî bikare mayînde bimîne. Bêguman ev yek ji siruştî edebîyatê neşet dike ku esasen beşek ji hunerên bedew e.

Bêguman ji bo derketina vê hunerê divê nivîskarê berhema klasîk bixwe kesayetêkî gihîştî û xwedî şîyan be. Nicolas Boileau (k.d.1711) ku wek damezirînerêkî bizava klasîzmê tê qebûlkin edebîyatê wek pîşeyêke dijwar li qelem dide û ji bo serkeftina di edebîyatê de hebûna qabilîyeteke ku bi çêbûna mirovî re tê dayîn

21 - Kaplan, b.n., r. 28-29.

22 - Kaplan, b.n., r. 29.

23 - Kefeli, b.n., r. 25-30.

24 - Beuve, g.n., r. 317.

25 - Italo Calvino, *Klasikleri Niçin Okumalı?*, wer. Kemal Atakay, YKY Yayınları, İstanbul 2008, r. 11-17.

şert dibîne. Li gor wî eger ev qabilîyet tunebe nivîskar dê bibe hêsîrê hizrên xwe.<sup>26</sup> Eliotê ku bi taybetî li ser vê mijarê radiweste ji derketina klasîkekê hebûna zihnekî kamil bi nivîskarî/ê re şert dibîne.<sup>27</sup> Bi kurtî qabilîyet hunera bilind, ew jî mayîndebûn û taybetmendiyên dî yên klasîkê encam dide.

Ji ber ku di klasîkan de edebîbûn roleke girîng dilîze divê mirov hinekî jî li ser pirsra “Gelo krîterên ku berhemekê dixin berhemeke edebî çi ne?” raweste. Gelo di Grek û Romaya antîk û di bizava klasîzmê de têgeha ku bi şeweya “hunera bipîvan” derbas bû di nav xwe de çi dihevine? Kefeli di çarçoveya edebîyata Rojavayê de sedemê temendirêjîya berhema klasîk bi zimanê wê yê esîl û mukemmel ve girê dide.<sup>28</sup> Di esasê xwe de di klasîkan de dupatkirina li ser hunerê taybetiyeke bizava klasîzmê ye. Li gor ku Beuve Akademîya Frensî (Academie Française) di bin tesîra bizava klasîzmê de û bi dijayetîya romantîzmê pîvana esasî ya klasîkan kirine huner. Di edîsyona sala 1835ê ya ferhenga Akademîyê de klasîk wek nivîskarê ku di zimanekî de bûye nimûne/model hatîye pênasekirin û nimûnebûn jî di çarçoveya rêzikên hunerî yên vegotinê yên guhernebar de hatîye destnîşankirin. Zewqa saf, îfadeyên xweser, hevokên nûjen û hessasîyeta li ser vegotina hizran wek taybetmendiyên hunerî yên klasîkan hatine qebûl kirin. Hêjayî gotinê ye ku li gor Beuve pênaseya klasîkê ya di çarçoveya hunerê de nêrîneke subjektîf a klasîzmê ya li dijî romantîzmê ye. Beuve vê têgihiştinê berteng dibîne û pênaseyeke berfirehtir a klasîkê jî dide.<sup>29</sup> Di sahaya Osmanî ya serdema Tenzîmatê de Ehmed Mîdhedê ku jêderên Ewropî etud kirîye xeyal û belaxetê wek du taybetmendiyên klasîkê destnîşan dike ku her du jî du esasên bingehîn ê edebîbûnê ne. Li gor wî eger berhemek ji van alîyan ve ji emsalên xwe ne pêşdetir be ew nabe klasîk.<sup>30</sup> Mîdhet di dewamê de ji bo klasîkbûna berhemê gelek xalên dî yên bi îfade û naveroka berhemê re têkildar jî dijimêre. Li gor wî ji bo ku berhemek bibe klasîk divê; di çarçoveya rêzikên ziman, bedî’ û beyanê de be, mijara wê pak û dirust be, ji aliyê şewaza nivîsînê ve spehî û vekirî be, armanca wê fêmbar be, mesaja wê bi nirx be, ne li dijî nirxên dînî-tarîxî-exlaqî be, bi awayekî mayînde bigihîje nîfşên paşerojê û mirov bicibînin, bi kêf bixwînin û tamekê jê bistînin.<sup>31</sup>

Tam li vê derê divê mirov li ser tam û lezzeta ku ji edebîbûnê tê standin raweste. Lewra tamstandina ji berhema klasîk û xwendina wê ya bi kêf jî wesfekî girîng ê klasîkê ye û wek pîvaneke klasîkbûnê hatîye destnîşankirin. Li gor veguestina

26 - Nedim Doğan O’Runeer, Nicolas Boileau ve Yazma Sanatı Adlı Eseri Üzerine, 2019, [https://www.academia.edu/40789142/Nicolas\\_Boileau\\_ve\\_Yazma\\_Sanatı\\_Adlı\\_Eseri\\_Üzerine](https://www.academia.edu/40789142/Nicolas_Boileau_ve_Yazma_Sanatı_Adlı_Eseri_Üzerine)

27 - Eliot, b.n., r. 159.

28 - Kefeli, b.n., r. 25-30.

29 - Beuve, g.n., r. 319-321. Hêjayî gotinê ye ku di edîsyona nehem a ferhenga Akademîya Frensî de ku niha li ber destan e maddeya klasîkê bi manayên nû hatîye berfirehkirin. Bnr. <http://www.dictionnaire-academie.fr/article/A9C2532> (02.04.2021).

30 - Kaplan, b.n., r. 13.

31 - Kaplan, b.n., r. 25-26.



Durmuş, Boileau klasîkê di vê çarçoveyê de pênase dike: “Berhema ku bi awayekî giştî li xweşîya herkesî biçe û herkes tam û lezzetê jê bistîne klasîk e. Ev heyê ku ev tam û lezzeta tam nayê îfadekirin, tê hîskirin. Lêbelê ev yek bi hizr û îfadeyên dirust saz dibe. Ew hizreke wisa ye ku herkes pesend dike lêbelê cara pêşî tê îfadekirin.”<sup>32</sup> Bi awayekî siruştî metnekî ku li gor krîterên estetîka edebîyatê hatibe nivîsîn dê vê tam û lezzetê bide xwînerê xwe ku ev yek hêmaneke bingehîn a pênase û mahîyeta edebîyatê ye.

Xaleke dî ya ku di mijara klasîkan de divê mirov li ser raweste xwendina wan e. Pir aşkera ye ku rêjeya xwendina klasîkeke cîhanê ya ku bi taybetmendiyên xwe yê newaze tam û lezzetekê dide xwînerê dê di asteke pir bilind de be. Edebîyatvanê Îtalyan Calvino ku wek teorisyenekî hevçax ê mijara klasîkê tê qebûl kirin di berhema xwe ya bi navê “Klasîk Çima Divê Bê Xwendin?” de li ser xwendina klasîkan tesbîtên ku zihne mirovî vedikin rêz dike ku puxteya wan weha dikare bêîfadekirin:<sup>33</sup>

- » Klasîk ew berhem in ku ji bo wan ji îfadeya “ez dixwînim” zêdetir îfadeya “ez ji nû ve dixwînim” tê bikaranîn.
- » Nexwendina klasîkan di ciwanîyê de ne kêmasîyek e. Dema berhemên klasîk piştî ciwanîyê di temenê kemalê de tên xwedin tameke cuda ya xarîqulade tê wergirtin. Loma klasîk ew berhem in ku çî yê duyem bin çî yê yekem bin di hemû xwendinên temenê kemalê de dewlemendî û tameke taybet didin.
- » Di xwendina ciwanîyê de ji ber sedemên wek bêtecrubîyê ji klasîkan tam sûd neyê wergirtin ji dirûvekî didin rûdanên dahatûyê û werin jibîrkirin ji vê rola xwe her dilîzin. Îcar dema ji nû ve tên xwendin ev mekanîzmaya navekî xwe dide der. Klasîk xwe bide jibîrkirin ji li hundirê mirovî dendikekê direşîne. Loma klasîk ew berhem in ku çî di esnayê jibîrkirinê de be çî di dirûvê derhişî de bi mekanîzmaya xwe ya navekî be her dem hebûna xwe didin nîşandan.
- » Klasîk ew berhem in ku dema di temenê kemalê de ji nû ve tên xwendin xwînerê edî guherîye û ew xwendin dibe xwendineke nû.
- » Her xwendineke nû wek xwendina yekem ji bo keşifkirina klasîkê ye.
- » Klasîk çî demê bê xwendin tu carî dawî li mesajên wan nayê. Derheqê klasîkan de her dem hin tiştên gotin, danasîn, analîz û rexneyên wan tên nivîsîn lêbelê ev ne mayende ne. Klasîk xwe ji wan paqij dikin û wek xwe dimînin.
- » Di klasîkan de gelek caran tiştên ku tên zanîn cih digirin lêbelê dema mirov wan dixwîne mirov dibîne ku ew tiştên gelekî nû, derî hêvîyan û bêmanend in.
- » Saîqa xwendina klasîkan ne erkeke e heskirin e. Di navbera gerdûn û berhema klasîkê de hevsengîyek heye. Hemû rûdan bi klasîkê ve tên girêdan û tevahîya gerdûnê dirûvê klasîkê werdigire.

32 - Tuba İsen Durmuş, “Türk Edebiyatında Klasik Algısı Üzerine Düşünceler”, *Millî Folklor*, 2011, sal 23, j. 90, r. 38.

33 - Calvino, b.n., r. 11-17.

- » Dijayetîya mirov bi mesaja klasîkê re hebe jî mirov nikare laqeydî wê bimîne û bêyî wê -digel dijayetîya wê- xwe pênase bike.
- » Klasîka mirovî li pêşîya klasîkên dî ye. Lêbelê mirovê ku berî klasîka xwe yên dî xwendibin dema ya xwe dixwîne demilsdest cihê ya xwe di nav şecereya klasîkan de ferq dike.
- » Berhemên rojane li hemberî klasîkan wek dengê keşmekeşîya trafikê ya derveyî pencereyê ne; divê mirov nekeve nav wê keşmekeşîyê lêbelê bê wê jî tev-negere û klasîkan ji nav rûdanên rojane analîz bike. Mijûliyên rojane çiqas ne li rê bin jî klasîk wek wî dengê piştî pencereyê her mayînde ye.”

Calvino di xala dawîn de li ser sazkirina hevsengîyekê di navbera berhemên klasîk û yên rojane de disekine. Lêbelê ev xal jî daxil hemû xalên ku nivîskar behsa wan dike di esasê xwe de bi xwendina klasîkan re pêwendîdar in ku navê berhema wî jî vê derê tê. Bi awayeki siruştî klasîka ku evqas zêde bê xwendin di wê astê de dê bê çapkirin jî. Tam li vê derê pêwendîya klasîkê ya bi kanonê re tê rojevê. Lewra berhema klasîk a ku zêde bê xwendin û bi caran bê çapkirin rê li ber vedibe ku bibe kanon.<sup>34</sup> Kanona ku wateya wê ya ferhengî cedwel e û jêcudakirina rastî û şaşîyê îfade dike, wek têgeheke dêrê tê maneya xiştîya berhemên pîroz ya ku kes nikare dest bidîyê û tiştêkî lê zêde yan jî kêmkî bike. Di sedsala XVIem de têgeha kanonê ji bo edebîyatê jî hatîye bikaranîn. Kanona edebîyatê normên sabit ên edebîyatê ne ku bi wan norman berhemên baş ji yên nebaş tînen cudakirin. Berhemên ku dibin kanon êdî wek berhemên pîroz tînen qebûlkin; kes nikare dest bide wan û di biwara nivîskar yan jî berhemê de gengeşeyeke nerênî bike. Tiştên ku ew nîşanî mirovan didin dibin qanûnên qetî. Klasîkek dikare bibe kanoneke bi vî rengî lêbelê di navbera klasîk û kanonê de cudahiyeke bingehîn heye. Di klasîkê de berhemên ku ne klasîk in wek berhemên bînxayî qebûlkin lêbelê di kanonê de berhemên ku li derve tînen hiştin biçûk tînen dîtin û tune tînen qebûlkin.<sup>35</sup>

Mirov dikare di çarçoveya vê cudahiya klasîk û kanonê de jî di biwara klasîkê de hin taybetmendiyên destnîşan bike. Ya yekem berhemên klasîk dikevin nav hîyerarşîyê û wek klasîkên asta yekem û yên asta duyem yan jî klasîkên cîhanî û klasîkên millî dikarin bînen dabeşkin. Ya dî jî klasîkek dikare di kategoriya kanonê de jî bê nîrxandin. Bo nimûne nivîskarên ku Harold Bloom (k.d.2019) dixwe nav kanona Rojavayê di heman demê de klasîkên Rojavayê ne ku Shakespeare di serê wan de tê.<sup>36</sup> Li alîyekî dî lo gorî Eliot (k.d. 1965) klasîkên edebîyata Îngilîzî tunene<sup>37</sup> lêbelê li gorî Bloom Shakespeare serê kanona Rojavayê ye. Bêguman nêrînên van her du rexnegirên girîng ên edebîyatê ji bo ku di biwara klasîkbûna

34 - Durmuş, g.n., r. 42.

35 - Turgay Anar, "Türk Edebiyatında Edebiyat Kanonu", *FSM İlmî Araştırmalar ve İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi*, 1 (2013) Bihâr, r. 56-58.

36 - Harold, Bloom, *Batı Kanonu*, wer. Çiğdem Pala Mull, İthaki, İst. 2014, r. 53-82.

37 - Eliot, b.n., r. 166, 173.

berhemekê de asayîbûna gihîştina darazên ji binî ve dijiyek nişanî me didin gelekî balkêş in. Çawa ku hiyerarşî û pilebendîya klasîkan tişteki asayî ye di biwara klasîkbûna berhemekê de hebûna darazên dijiyek jî tişteki asayî ye.

Herçiqas dema klasîk tê gotin zêdetir berhemên ku di çarçoveya dustûrên bizava klasîzmê de li ser esasên klasîzma antîk hatine nivîsîn tîne fêmkirin jî ne lazim e hemû berhemên klasîk jî nav bizava klasîzmê derkevin. Bêguman berhemên bizavên di jî bi dêrîni, xweserî, şêwaza edebî û tesîra xwe dikarin bibin berhemên klasîk. Lêbelê ev heye ku krîterên ku payeya klasîkê didin berhemekê, bi awayekî tradîsyonel, di çarçoveya dustûrên bizava klasîzmê de ne ku paşxana wê ya tarîxî vedigere heta bi serdema klasîk a antîk. Hêjayî gotinê ye ku di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî bizavên cuda hene. Bêguman di edebîyata Kurdî de bizavên edebî yê ku li pey hev beramberî klasîzm, romantîzm û realîzm bîne tunene. Taybetmendiyên van bizavan di edebîyata Kurdî de pêkve tîne dîtin. Herweha di edebîyata Kurdî de bizavên edebî yê Îranî û yê xwemalî jî tîne dîtin ku ev mijareke derî sînore vê vekolinê ye.

Em ê vê beşê bi xulasekirina krîterên ku berhemekê dikin klasîk bi dawî binin û van krîteran di deh xalan de rêz bikin:

1. Dêrînbûn
2. Aîdiyeta çîneke bilind
3. Şîyana nivîskarî
4. Asta bilind a hunerî
5. Derketina jî nav şaristaniyeke mezin yan serdemeke zêrîn
6. Gerdûnbûn
7. Mayîndebûn
8. Sazkirina tradîsyoneke edebî
9. Xwendin û çapkirin
10. Wergirtina tam û lezzeta derûnî

### 3. Mijara Klasîkan ji Pencereya Edebîyatên Îslamî ve

Herçiqas dema klasîkên cîhanê tê gotin berî hemûyan yê Rojavayî tîne bîra mirovî jî bêguman li cîhanê klasîkên şaristaniyên di jî hene. Bi taybetî edebîyata Rojhilatê ya Îslamî di nav edebîyata cîhanê de cihekî xwe yê girîng heye ku edebîyata Kurdî ya klasîk jî beşek jê ye. Ji ber vê pêwendiyê jî analîza klasîkên Kurdî bîyî analîza klasîkên Îslamî ne pêkan e. Heta mirov rewşa edebîyatên Erebî û Farisî ku jêderên edebîyata Kurdî ne û rewşa edebîyata Tirkî ku cîranê edebîyata Kurdî ye baş fêm neke mirov dê nikaribe di biwara edebîyata Kurdî de jî bigihîje daraz û encameke dirust.



Dema mirov ji aliyê klasîkan ve li edebîyata Îslamî dinêre<sup>38</sup> tê dîtin ku di nav endamên vê hewzeya edebîyatê de edebîyatên Erebi û Farisî derfeta derxistina klasîkên cihanê bi dest xistine. Ev her du edebîyatên ku ev derfet bi dest xistine çawa ku damezirînerên edebîyata Îslamî ne di heman demê de ji edebîyatên di yê Îslamî yê wek Kurdî, Tirk û Urdu re jî bûne jêderên esasî. Çawa ku edebîyatên millî yê miletên Ewropî li ser esasê edebîyatên antik ên Grek û Romayê ava bûne bi heman rengî edebîyatên miletên Misilman jî li ser esasên edebîyatên Erebi û Farisî ava bûne. Hevterîbê vê rewşê çawa ku wek edebîyatên jêder ji Yewnanî û Latîni klasîkên cihanê derketine ji Erebi û Farisî jî derketine ku ev tiştêkî fêmbar e. Dikare bê gotin ku edebîyatên ku damezirînerên şaristanîyekê, yan jî hewzeyekê ne bi awayekî siruştî klasîkên xwe jî derxistine.

Ji aliyekî di ve jî edebîyatên Erebi û Farisî xwedî zimanekî standart ê edebî û serdemeke zêrîn a desthilatdarîyê ne, di encama van de edebîyateke wan a bihêz ava bûye û derketina klasîkan jî di encama van tevan de pêk hatîye. Dema em li edebîyatên di yê Îslamî yê wek Kurdî, Tirkî û Urdu ku li ser esasê edebîyatên Erebi û Farisî ava bûne dinêrin em dibînin ku di babeta klasîkan de rewşeke dilxweşker a van edebîyatan tune ye û ji van edebîyatan berhemên klasîk ên ku bûne malê cihanê derketine. Bêguman di çarçoveya edebîyatên millî de klasîkên van edebîyatan hene. Lêbelê klasîkên van edebîyatan di bin siha jêderên xwe de mane û edebîyatên cihanê li aliyekî di nav edebîyatên Erebi û Farisî bi xwe de jî tam belav nebûne.

Di vê mijarê de edebîyatên Ewropî ku jêderên wan Yewnanî û Latîni ne û yê Rojhilatî ku jêderên wan Erebi û Farisî ne di xaleke esasî de ji hev cuda dibin. Dema miletên Ewropî edebîyatên Gerek û Romayê esas digirtin şaristanîya Ewropî ji her aliyê ve ketibû nav geşedaneke hizrî, civakî û zanistî. Lêbelê dema miletên Misilman edebîyatên Erebi û Farisî esas digirtin şaristanîya Îslamî ketibû nav lawazî û paşveçûnê. Ji ber vê yekê jî edebîyatên Ewropî di bi siha jêderên xwe de neman û klasîkên xwe derxistin lêbelê yê Îslamî nekarîn vê derfetê bi dest bixin. Sedemêkî di jî ew e ku edebîyatên Kurdî, Tirkî û Urdu nekarîne wek edebîyatên Erebi û Farisî zimanekî millî ê standart ava bikin. Wan seyrra xwe ya edebî di zeman û mekanên cuda de di çarçoveya diyalektên edebî yê cuda de domandine. Li şûna ku hemû potansiyela edebî ya van miletan di forma zimanekî standart de derkeve meydanê ev potansiyel di nav çendin formên cuda de belawela bûye û derketina edebîyateke bihêz a xwedî klasîk ji dest çûye.

Bêguman em ê li vê derê ji van edebîyatan re cihekî zêde veneqetînin. Ji ber ku edebîyata Farisî lutkeya edebîyata Îslamî temsîl dike û ji aliyê coxrafi û çandî ve Farisî û Kurdî jî hev nayên cudakirin edebîyata Farisî û ji ber ku edebîyatên Tirkî

38 - Ji bo perspektîfêke giştî di biwara klasîkên Îslamî de bnr. Yusuf Çetindağ, "Şark Klasikleri ve Özellikleri", *Dergâh*, b. 16, j. 191, 2006, r. 9-15.

û Kurdî cîran in û di navbera wan de pêwendîyeke xurt a îdarî heye edebîyata Tirkî ji bo me pir girîng in. Dema em li edebîyata Farisî dinêrin em dibînin ku gelek klasîkên wê yên ku bo zimanên Rojavayî hatine wergêran hene û van klasîkan bi rastî jî di nav zimanên Ewropî de şopeke mezin hiştine. Hêj di sedsala XVIem de *Gulistana* Se'dîyê Şîrazî bi rêya wergêranê bo zimanên sereke yên Ewropî hatiye veguhestin (wergêrana Frensî: 1634, ya Almanî: 1635 û ya Latînî: 1651) û ji wê rojê heta bi roja me bo piranîya zimanên Ewropî bi dehê caran wergêranên wê hatine kirin.<sup>39</sup> Se'dî di nav edebîyatvanên Ewropî de tesîreke wisa ava kirîye ku bi navê "Se'dîşinasî"yê qadeke serbixwe a zanistî ava bûye.<sup>40</sup> Ruba'iyên Omer Xeyyam jî hêj di sedsala XVIIIem de bo zimanê Latînî hatine wergêran.<sup>41</sup> Ji bilî Se'dî û Xeyyam bi taybetî Mewlana, Hafiz û Nîzamî jî bi rêya wergêranê li Ewropayê hatine naskirin û li ser edebîyatên Rojavayê tesîreke mezin nişan dane.

Li vê derê em dixwazin ji bo rengvedana klasîkên edebîyata Farisî ya li ser edebîyata Ewropî ji Hafiz û Nîzamî du nimûneyan bidin. Bi rastî jî tesîra Hafiz ya li ser Goethe ji baştirîn nimûneyên vê diyardeyê ye ku divê di serî de bê dayîn. Dehayekî wek Goethe di wê dereceyê de di bin tesîra dîwana Hafiz de maye ku di serdemeke zêrîn a edebîyata Ewropî de ku bizavên klasîzm û romantîzmê di lutkeya hêza xwe de ne, bi rêya wergêrana dîwana Hafiz ya ku ji aliyê Hammer ve bo Almanî hatibû kirin, bûye şogerekî nûawer ê dîwana Hafiz. Di encamê de Goethe wek berhemeke xwe ya temenê kemalê bi navê *Dîwana Rojava û Rojhilatê* dîwanek nivîsiye, bi vê dîwanê di helbesta Ewropî de nûawerîyeke mezin kirîye û bi awayekî pir balkêş ji saqî heta bi muxennîyê û ji evîna mecazî heta bi evîna heqîqî piranîya têgeh, mezmûn û mijarên helbesta klasîk a Îslamî veguhestine nav edebîyata Almanî.<sup>42</sup>

Klasîka duyem ku ji edebîyata Îranê em ê li ser rawestîna *Heft Peykera* Nîzamî ye. Rexnegirê navdar ê Îtalyan Italo Calvino *Heft Peykera* ku li Îtalyayê ji aliyê weşanxaneyê Rizzoli ve di nav rêzepirtûkên Biblioteca Universale Rizzoli (Pirtûkxaneyê Rizzoli ya Gerdûnî) de derketîye wek klasîkeke xwe ya bijarte di berhema xwe ya navdar "Klasîk Çima Divê Bê Xwendin?" de daye nasandin û xistiye nav çend klasîkên pêşîn ên xiştîya xwe. *Heft Peyker* cara pêşî di sala 1924ê de bi wergêraneke ne serkeftî bo zimanê Ingilîzî, piştî bi wergêraneke serbest bo zimanê Almanî hatiye veguhestin. Herî dawî Alessandro Bausani û Giovanna Calasso wergêraneke berhemê ya sade bo zimanê Îtalî kirine û berhem di

39 - Tahsin Yazıcı, "Gülîstân", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/gulistan> (29.03.2021).

40 - Ebdulxefûr Rewanê Ferhadî, "Se Qern û Nîmê Se' dîşinâsî der Xerb ez Rûyê Tercumehayê Gulistan û Bostan", *Zikrê Cemîlê Se'dî*, Tehran 1364, II, 175-196; Herweha bnr. Ahmed Midhat, "Mûsabaka-i Kalemîyye İkrâm-ı Aklam", *Ramazan Kaplan, Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*, Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, Ankara 1998, r. 129.

41 - Yavuz Unat, "Ömer Hayyâm", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/omer-hayyam#1> (28.03.2021).

42 - Ji bo wergêrana Tirkî bnr. Johann Wolfgang Goethe, *Batı Doğu Divanı*, wer. Gürsel Aytaç, Hece Yayınları, İst. 2021.

weşanxaneya Leonardo da Vinci de dane weşandin. Piştêre bi veguhestina hemû mecazan bo zimanê Îtalî -digel dayîna peyvên Farisî yê orjînal di nav kevanekane de-, bi tîbînîyên dewlemend, bi pêşekî û kelûpelên dîtbarî xebateke pir baş li ser berhemê kirine û vê carê jî di nav weşanxaneya Rizzoli de dane weşandin. Calvino jî mijarên dînî yê dîbaceyê heta bi evîna Behram a bo heft prensesan taybetmendîyên curbicur ên mesnewîya evîni wek taybetmendîyên çandeke dûr bi nav dike û bi taybetî mijarên evîni yê ku di bin rengvedana çanda Rojhilata Îslamî de dirûv girtine bi motif û epîzotên evîni yê edebîyata Rojavayê re muqayese dike û li ser wergêrana berhemê ya bo zimanê Îtalî kêfxweşîya xwe weha tîne zimên: “Bi zêdekirina şakareke edebîyata cîhanê ya bikêf û xweser li nav refên pirtûkxaneya xwe em [Îtalî] bi siûdeke ku nabe nesîbê herkesî sîudemend bûne.” Hêjayî gotinê ye ku dema Calvino Nizamî dide nasandin û dibêje ew xelkê Genceyê ye di nav kevanekê de şîroveyekê dike û weha dibêje: Li gor ku ji Genceyê ye wî di nav civakeke tîkel de ku ji Fars, Kurd û Tirkan pêk tê jîyana xwe bûrandîye.”<sup>43</sup>

Çawa jî van her du nimûneyan tî fêmkirin edebîyata Farisî di nav bazara edebîyata cîhanê de dezgeheke xwe ya mezin vedaye. Guman tune ye ku dersên ku edebîyata Kurdî jî vî serborîya edebîyata Farisî wegire dê hebin. Lêbelê em niha nakevin nav vî mijarê û em ê li edebîyata Tirkî ya ku cîranê edebîyata Kurdî ye binêrin. Berî her tiştî divê bê gotin ku edebîyata Tirkî, di mijara klasîkan de, jî ber sedemên ku li jorê behsa wan hat kirin, wek edebîyata Farisî ne bi siûde e. Bêguman jî edebîyata Tirkî berhemên edebî yê ku bo zimanên Ewropîyan hatine wergêran gelek in. Bo nimûne *Leyla û Mecnûna* Fuzûlî bi rêya wergêranê bo zimanên Almanî, Îngilîzî û Îspanyolî hatiye veguhestin.<sup>44</sup> Lêbelê çawa ku di xebatên hevçax ên akademîsyenên Tirkan de jî tî ifadekirin di roja me de di çavçoveya edebîyata cîhanê de berhemên edebîyata Tirkî wek klasîk nayên qebûl kirin.<sup>45</sup> Mijara klasîkan cara pêşî di serdema Tenzîmatê de, di sala 1897ê de, bi nivîsareke Ehmed Mîdhedî ketîye rojeva dewrûberên edebîyata Tirkî. Li gor nêrîna Mîdhedî di edebîyata Tirkî de serdemeke klasîk tune ye û ne mimkin e di vî edebîyatê de berhemên wek *Faust*, *Le Cid*, *Andromaque* û *Romeo û Juliet* derkevin meydanê. Loma divê ev berhem qet nebe bi rêya wergeranê bo Tirkî bî veguhestin.<sup>46</sup> Dîsa li gor wî derbasbûna dewreke klasîk a edebîyata Tirkî deynin alîyekî dewreke bi vî rengî ya edebîyata Tirkî heta niha hêj nehatiye<sup>47</sup>. Lêbelê li gorî Ehmed Cewdet her zimanekî medenî xwedan berhemên klasîk e û çawa ku klasîkên Yewnan, Roma, Ereba, Ecem (Fars), Frensîz, Alman û Îngilîzan hene

43 - Calvino, b.n., r. 57-63.

44 - Abdülkadir Karahan, “Fuzûlî”, TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/fuzuli> (29.03.2021).

45 - Durmuş, g.n., r. 37.

46 - Midhat, g.n., r. 68.

47 - Midhat, g.n., r. 67.



klasîkên Tirkan jî hene. Cewdet di vê çarçoveyê de berhemên Suleyman Çelebî, Sinan Paşa, Nefî, Bakî, Na'ima, Cevdet Paşa û Mu'ellim Nacî wek klasîkên edebîyata Tirkî nîşan dide.<sup>48</sup> Li gor Hilmi Yavuz jî qebûlkirina nebûna klasîkên Tirkî ji bo kesên wek Yunus Emre, Bakî Efendi, Karacaoğlan, Evliya Çelebî û Şeyh Galip dê bibe neheqîyek. Lewra muheqqeq tişteki ku ew ji bo me bibêjin heye. Qebûlkirina nebûna klasîkan tişteki xetere ye. Lewra ev bi nebûna rabirdû û çandêke mayînde re tê heman wateyê. Çandêke bê klasîk ne mimkin e. Di roja me ya ku mîtolojîya çandên bedewî jî ji bo mirovên roja me watedar tî qebûlkirin qebûlkirina çanda Tirkî wek çandêke bê klasîk darazeke ji insafê xalî ye. Mesele ne ew e ku di rabirdûyê de şaheser nehatine dayîn mesele ew e ku ew şaheser di peywenda çareserkirina problemên hevçax de nayên xwendin û şîrovekirin.<sup>49</sup>

Esasen Yavuz ji aliyê hebûna klasîkên millî yê edebîyata Tirkî ve mafdar e. Bêguman di vê çarçoveyê de klasîkên edebîyata Tirkî hene û hin ji van klasîkan bi rêya wergêranê bo zimanên biyanî jî hatine veguhestin. Lêbelê pîrsa ku divê bê bersivandin ev e: Gelo van klasîkan wek yê Farisî di edebîyata Rojavayê de, ji wê wêdetir di edebîyatên Erebi û Farisî de jî şopek li pey xwe hiştine? Em ê nîqaşa hebûna klasîkên Tirkî yê cihanî deynin aliyekî û li ser mijareke di ya ku bi klasîkên millî yê edebîyata Tirkî ve pêwendîdar e rawestin ku ev mijar dê ji bo edebîyata Kurdî jî gelekî mefadar be: Di sedsala XXem de bi avabûna dewleta Tirkîyeyê re di çarçoveya siyaseta resmî ya wezareta perwerdeyê de girîngîyeke mezin bo klasîkên cihanê hatîye nîşandan û di salên 1940î de wergêrana van klasîkan bo zimanê Tirkî wek armanceke mezin a perwerdeya millî ya dewletê hatîye cîbicîkirin. Ji wê demê ve li Tirkîyeyê serê çend salan carekê çî ji aliyê dezgehên fermî ve be çî ji aliyê dezgehên sivil ve be, çendî xîştayên klasîkan bo raya giştî ya Tirkîyeyê hatine pêşkêşkirin û bo xwendekaran hatine tewsîyekirin.<sup>50</sup> Herî dawîn di sala 2005an de ji aliyê wezareta perwerdeyê ve li ser klasîkan komxebatek hatîye kirin û ji nav klasîkên edebîyata Tirkî û yê cihanê ji bo qedemeya navîn a xwendîngihan 100 berhem (70 berhem ji edebîyata Tirkî û 30 berhem jî ji edebîyatên cihanê) û ji bo qedemeya bilind (lîse) jî 100 berhem (73 berhem ji edebîyata Tirkî û 27 berhem ji edebîyatên cihanê) hatîne tewsîyekirin.<sup>51</sup>

Esasen di sedsala me de li Rojavayê li Rojhilatê ji bo ku di prosesa perwerdeya bingehîn de di dersên edebîyatê de cih bigirin hin xîştayên klasîkan tî amadekirin û tê hêvîkirin ku xwendekar hêj di temenê xwendekariyê de klasîkên cihanê nas bikin û dest bi xwendina wan bikin.<sup>52</sup> Dikare bê gotin ku pêşniyazkiri-

48 - Kaplan, b.n., r. 34.

49 - Yavuz, g.n., r. 32-33.

50 - D. Mehmet Doğan, *Neden Klasiklerimiz Yok?*, Yazar Yay. İst. 2016, r. 97-100.

51 - Doğan, b.n., r. 167-174.

52 - Ji bo xîştayeke ku bo Emerîkiyan hatîye amadekirin bnr. Durmuş, g.n., r. 40-41; Ji bo yê Tirkî bnr. Doğan, b.n., r. 165-269.

na xiştayên klasîkan di çarçoveya sîyaseta resmî ya wezaretên perwerdeyê de wek taybetîyeke bingehîn a dewletên modern derdikeve pêş. Calvino tewsiyekirina klasîkan wek wezîfeyeke siruştî ya xwendingehan dibîne û îfade dike ku mirov piştî perwerdeyê ji nav wan klasîkan yan jî bi îlhama wan derfeta dîtina klasîka xwe bi dest dixê.<sup>53</sup>

Bi vî awayî, bi qasî ku perspektîfeke giştî bide me, me cihê klasîkên edebîyatên Farisî û Tirkî di nav klasîkên cîhanê de dîyar kir û wek polîtîkayeke perwerdeyê ya dewletên modern mijara amadekirina xiştayên klasîkan anî rojevê. Bêguman dema em li jêrê li ser klasîkên edebîyata Kurdî analizên xwe bikin em ê ji woneyan sûd wergerin. Niha em dikarin berê xwe bidin klasîkên edebîyata Kurdî û pêşî ji rabirdûya mijara klasîkan di nav edebîyata Kurdî de dest bi mijarê bikin.

#### 4. Rabirdûya Mijara Klasîkan li Nav Kurdan

Bi qasî ku tê dîtin, di edebîyata Kurdî de seyra tarîxî ya mijara klasîkan zêde ne kevin e. Dikare bê gotin ku ev mijar heta niha -bi taybetî li nav Kurdên Bakur- bi awayekî rasterast, şênber û berfireh neketîye rojê dewrûberên edebîyata Kurdî. Lêbelê digel vê jî nivîskarên ku bi awayekî ji awayan destê xwe li derîyê mijara klasîkan xistine hene. Bêguman ji bo ku mirov bikare li ser mijara klasîkên Kurdî analîzeke dirust bike divê mirov têngihîştina Kurdan a li ser mijarê bizane. Loma em ê niha bi kurtî di çarçoveya pîrsa “Gelo heta niha di edebîyata Kurdî de li ser mijara klasîkan çî hatîye îfadekirin?” de li ser mijarê rawestin û ji sê nûnerên edebîyata Kurdî ku her yek ji wan qonaxêke kronolojîk tesmîl dike (Hemzeyê Miksî ji serdemawîya Osmanîyan, Mela Ehmedê Zivingî ji nîveka sedesala XXem û M. Emin Bozarslan ji dawîya sedesala XXem) nimûneyan pêşkêş bikin:

Hemzeyê Miksî (k.d.1958) yek ji nivîskarên pêşîn ên Kurdan e ku peyva “klasîk”ê bi lêv nekiribe jî li ser vê mijarê rawestîyaye. Miksî ji bo çapa yekem a *Mem û Zînê* ya ku di sala 1335 (1919)an de li Stenbolê li ser navê “Kürd Te’mîmî Me’arif ve Neşriyat Cem’iyeti”yê hatîye çapkirin, di bin sernavê “Edebîyat û Asarê Edebî” de dîbaceyek (pêşgotinek) nivîsîye û di vê pêşgotinê de hizrên xwe yê di biwara klasîkan de weha îfade kirine:<sup>54</sup>

“Edebîyat û Asarê Edebî

Ji bo her qewm û miletekî edebîyat û asarê edebî wek xîmê qewî ne ji bo serayêt ‘alî. Miletê xweyî edebîyat çî qeder bikevit, serayê selteneta wî yê maddî biherivit dîsa bi himmetekê tete te’mîrkin.

53 - Calvino, b.n., r. 14-15.

54 - Hemzeyê [Miksî], “Dibace”, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, Necm-i İstikbal Matbaası, İstanbul 1335 (1919), r. 138-139.

Milletê Yewnan digel hindikî û bêqewetîya xwe çend ‘esran mewcûdîyeta xwe winda kir, bû wîlayetekî Osmanîyan, emma edebîyat û asarê Yewnanî di Ewropayê de terefdar peyda kirin, xweyîyê xwe ji destê Osmanîyan derêxistin.

Îran maddeten mehwa bû, bû esîrê ‘Ereban, piştî wê kete binê esareta Tirkan. Feqet lîsan û edebîyatê Farisî dîsa Îran îna wicûdê, digel wê qasê ku Furs wek heyûlayê navê wî heye bixwe nîne.

Ereb, heşt-neh ‘esr e selteneta xwe winda kirîye. Feqet lîsan, edebîyat û asarê Erebi li Şerqê û Xerbê hakim e; behemehal tê sahibê xwe binine wicûdê, çawan tînin.

Bîna li vê heqîqetê her qewm û milletê ku arzûya mewcûdîyet û selteneta xwe ya millî bikin, lazim e ji ewwel emir ve îhtîmamekî qewî bidine edebîyat û asarê xwe yê edebî. Ev heqîqeta han di pêşîya çar esran de Hezretê Ehmedê Xanî derk kirîye û ji bo wê xebitîye....

Xasma di vê esrê da di alema medenîyetê da huccet û berata milletan lîsan û edebîyatê wan e. Yê bêhuccet, bêberat, de’wa wî nayête sehkirin, kes guhê xwe nadetê. Meger me’lûm bibit ku berata wî jê hatîye standin....”

Çawa ku tê dîtin Miksî behsa sê milletên xwedî edebîyateke bihêz kirîye ku ew jî Yewnan, Fars û Erebi in û serxwebûna wan bi berhemên wan en edebî yên ku li cîhanê tên naskirin ve girê daye û Mem û Zîn jî di wê kategorîyê de nirxandîye. Pir aşkera ye ku Miksî di vê nivîsara xwe de bêyî ku peyva klasîkê bi nav bike behsa klasîkên cîhanê kirîye, girîngîya wan anîye ziman û li ser rola wan a ku di qada navneteweyî de dilîzin sekinîye. Li gor nêrîna wî klasîkên milletekî yên ku li cîhanê tên naskirin, di guherîna qedera wî milletî de roleke heyatî dilîzin. Bêguman wî *Mem û Zîna* Xanî wek berhemeke edebîyata Kurdî di vê peywendê de jimartîye û bi awayekî siruştî Mem û Zîn wek klasîkeke edebîyata Kurdî qebûl kirîye.

Şarihê navdar ê dîwana Melayê Cizîrî Mela Ehmedê Zivingî (k.d. 1971) jî ji aliyê asta bilind a edebî ve cihê dîwana Melayê Cizîrî di edebîyata Kurdî de wek cihên dîwanên Hafîzê Şîrazî û Mela Camî di edebîyata Farisî, dîwana Îbn Farîd di edebîyata Erebi û dîwana Fuzûlî di edebîyata Tirkî de destnîşan kirîye.<sup>55</sup> Di esasê xwe de Zivingî jî wek Miksî bêyî ku peyva klasîkê bi kar bîne behsa klasîkan kirîye û dîwana Melayê Cizîrî bi klasîkên edebîyatên Erebi, Farisî û Tirkî re hevyeke kirîye.

M. Emîn Bozarslan jî wek Miksî û Zivingî bêyî ku peyva klasîkê bi kar bîne, pêşgotina wergêrana xwe ya *Mem û Zînê* bi mijara klasîkan daye destpêkirin :

55 - Mela Ehmedê Zivingî, *el-‘Iqdu’l-Cewherî fî Şerhî Dîwanî eş-Şeyxî’l-Cezerî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.



“Mem û Zîn di nava pirtûkên bêjeyî yên dinyayê ên nemir da li qora pêşîn cîh girtîye. Ev pirtûka gewre bi babetê xwe hevtayê Romeo û Júllyet’a Şekspîr û Leyla û Mecnûn’a Fizûlî’ye.”<sup>56</sup> Bozarlan herçiqas peyva klasîkê bi kar neanîbe jî dema mirov wî bi Miksî û Zivingî re muqayese dike mirov dibîne ku wî ji bo klasîkan pênaseyek jî pêşkêş kirîye (“pirtûkên bêjeyî yên dinyayê ên nemir”) û yek jî Rojhilatê û yek jî ji Rojavayê navên du klasîkan jî wek nimûne dane.

Çawa tê dîtin kesayetên jorîn klasîkên edebîyata Kurdî li kêleka klasîkên cîhanê zikir kirine lêbelê ne peyva klasîkê bi lêv kirine ne jî li ser mahîyeta wê rawestîyane. Esasen ev yek ne tenê taybetîyeke edebîyatvanên navborî ye ku bi çanda klasîk a Kurdan perwerde bûne. Balkêş e ku dema wergêrana *Mem û Zînê* bo Îngilîzî hatîye kirin jî di pêşgotina ku wergêr nivîsîye de bi awayekî şênber mijara klasîkan nehatîye nîqaşkirin.<sup>57</sup>

Bi qasî ku tê dîtin di edebîyata Kurdî de kesê ku têgeha klasîkê bi nav kirîye û rasterast li ser vê mijarê nivîsarek weşandîye Celadet Alî Bedirxan e. Bedirxan ev nivîsara xwe di sala 1941ê de di kovara Hawarê de bi mexlesa Herekol Azîzan di bin sernavê “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” de weşandiye (Hawar, 1941, hej. 33, r. 6). Berdixan di nivîsarê de têgeha klasîkê bi awayekî berfireh îzah dike û piştî derheqê 26 helbestvan û nivîskarên edebîyata Kurdî ya klasîk de zanyariyên giştî yên biyografîk û bîbliyografîk rêz dike. Ji ber girîngîya wê em beşa yekem ê vê nivîsarê ku di biwara têgeha klasîkê de ye li jêrê pêşkêş dikin:<sup>58</sup>

“Em dikin qala klasîkên xwe bikin. Lê berî ewilî divêt em li bêjeya “klasîk”ê hûr bibin. Ji ber ko ew bêje bi me ne nas e. Di edebîyata milletên ewropayî de heyamek heye jê re heyama klasîkan dibêjin. Ew heyama ko tê de şahir û edîbên klasîk rabûne. Ji wan edîb û şahiran bi xwe re jî klasîk dibêjin. Ewan edîbên ha teqlidî edîb û şahirên yewnan û latînî dikirin û li gora usûl û qeydeyên wan dinivîsandin; gelek bala xwe didan wan isûl û qeydan, yanî gelek isûl û şikilperest bûn. Ji edebîyatê pê ve ji her tiştî re ko di wextê kevin de û bi islûbeke bijarte hate çekirin klasîk dibêjin. Di warê mûsîqiyê de jî klasîzm heye. Herçî bestekarên wê heyamê ne ji wan re jî klasîk dibêjin. Mîmarîya klasîk jî heye. Xulase herçî fen û sinhetên ko bi wê rêzîkê ve çûne ji wan re klasîk dibêjin.

Gelo di edebîyatê de klasîkên kurdmancan kî ne? Ew kengê rabûne û bi paş xwe ve çî eser hiştine?

Bersiva vê pirsîyariyê ne hêsanî ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe jî eserên beriya islamiyetê hesêb tişteke ne maye. Piştî islamiyetê ji nav Kurdan gelek şahir,

56 - M. Emîn Bozarlan, “Pêşgotin”, *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Gün yay., İst. 1968, r. 8.

57 - Salah Saadalla, “Preface”, *Ahmed Khani, Mem Zin*, wer. Salah Saadalla, Avesta, Istanbul, 2008, r. 9-13.

58 - Herekol Azîzan, “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998, r. 813.

edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivîsandine; û ji wan milet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahîrên tirkî an ên mezin yên ko serê tirkî bilind dikan Nabî, Nefhî û Fuzûlî her sê jî kurdmancî in. Yên ko bi kurdmancî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe ne daye zimên û çêtir kêfa xwe ji pirsên erebî û farisî re anîne. Digel vê hindê ev çend eserên ko pêşyan ji me re hiştine edebiyata me a klasîk dîtînin pê û di nav wan de eserine kûr û hêja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî diekve rêza pêşîn. Di rohelatê nizing de folklorê tu milletî negihaştîye dereca folklorê me.

Herçî klasîkên me, herwekî me got ew behseke dirêj û zehmet e û jê re wextekî fireh divêt. Ev ne işê bendekê an du bendan e. Heke îro em vê bendê dinivîsînin mexseda me ne ew e ko em li vê behsê hûr bibin û klasîkên xwe bisenifînin. Bi tenê em dixwazin vê behsê vekin; bi hêviya ko hinên din pê mijûl bibin û tiştê tekûz bi ser xin.

Di vê bendê de em ê bê awerteyî qala hemî şahîr û edîbên kurdmancî bikin yên ko bi kurdmancî nivîsandine. Heye ko, hinekê wan bi tenê şahîrê dîwanê ne û ne klasîk in. Bila misenîfê klasîkan bi wan mijûl bibe û klasîkan ji neklasîkan bibijêre; û heqê herkesî li gora hêjabûna wî bidiyê...”

Berdîrxan di vê xebatê de, bêyî ku referansan bide, têgeha klasîkê bi wateya xwe ya cihanî di çarçoveya klasîkên serdemên zêrîn ên Ewropî, bizava klasîzmê û klasîkên Yewnan û Latînî de pênase û şîrove kirîye. Di esasê xwe de nivîsara wî li ser du beşan dikare bê dabeşkirin. Beşa yekem danasîna têgeha klasîkê ye, beşa duyem jî bi şêweya tezkîreyên berê yan jî bi şêweya ferhengeke ansîklopedîk danasîna hemû edebîyatvanên Kurd e ku wî navên wan bihîstine. Beşa yekem wek mijareke teorîk, beşa duyem wek vekolîneke qada tarîxa edebîyata Kurdî derdikeve pêş. Esasen dikare bê gotin ku Celadet di sernavê vekolîne de (Klasîkên Me an Şair û Edîbên Me ên Kevin) îşaretî van her du beşan kirîye. Li vê derê îfadeya “klasîkên me” beşa yekem a nivîsarê (têgeha klasîkê) û îfadeya “şair û edîbên me ên kevin” jî beşa duyem a gotarê (tarîxa edebîyata Kurdî) nîşan dide.

Bêguman beşa duyem a nivîsara Bedîrxan jî ji aliyê tarîxa edebîyata Kurdî ve girîngîyeke xwe ya gelekî zêde heye.<sup>59</sup> Lêbelê beşa yekem a nivîsarê jî di çarçoveya mijara me de gelekî girîng e. Bi qasî ku tê dîtin kesê ku cara pêşî klasîkên ede-

59 - Di qada tarîxa edebîyata Kurdî de yekemîn xebata ku li Sûriyeyê hatîye kirin ev nivîsar e. Ev xebat piştî rîsaleya A. Jaba duyemîn xebata tarîxa edebîyatê ye ku bi Kurdîya Kurmancî hatîye nivîsîn. Digel ku berî berhema Qenatê Kurdo ye jî, ji aliyê himjara helbestvan û nivîskarên Kurmancî ve ji berhema Kurdo dewlemendtir e. Helbestvan û peşannûsên ku di vê nivîsa Bedîrxan de cih girtine ev 26 kes in: Elîyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Batê, Axayê Bêdarî, Ehmedê Xanî, Simailê Bazîdî, Şerefxan, Miradxan, Siyahpoş, Axaok, Mewlana Xalid, Mela Yehyayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Nalî, Şêx Rîza, Hacî Qadirê Koyî, Şêx Nûredînê Birîfkî, Evdîrehmanê Axtepi, Elîyê Teremaxî, Mela Ünîsê Erqetînî, Melayê Erwasî.

bîyata Kurdî di peywenda klasîkên cîhanê de anîye rojevê Celadet Alî Bedirxan e. Lêbelê ev heye ku Celadet ne behsa krîterên ku berhemekê/nivîskarekî dikin klasîkeke cîhanê kirîye, ne jî di biwara berhemên edebîyata Kurdî yên ku wesfê klasîkê heq dikin de tesnîfek pêşkêş kirîye ku wî bixwe jî ev yek bi dilnîyayî îfade kirîye. Celadet wek rewşenbîrekî ku di ferqa zehmetî û firehîya mijara klasîkê de ye tenê mijar xistîye rojevê û analiz û tesnîfên li ser klasîkên Kurdî hewaleyê xebatên paşerojê kirine. Mixabin digel ku Bedirxan bingeha mijara klasîkan avêtîye û pêxistina mijarê hiştîye bi hêvîya nîfşên pey xwe re jî, bi qasî ku tê dîtin, piştî wî li ser bingeha wî tiştek nehatiye avakirin.

Di roja me de li nav Kurdan girîngîya mijara klasîkên edebîyata cîhanê û klasîkên edebîyata Kurdî li gorî berê zêdetir tê fêmkirin. Gelek weşanxaneyên Kurdan hene ku rêzertûkên klasîkên Kurdî diweşînin. Ji alîyekî dî ve heta niha wergêrana tibabek klasîkên edebîyata cîhanê bi taybetî bo Kurdîya Soranî û Kurmançî û hinek klasîkên edebîyata Kurdî bo zimanên cîhanê hatîye kirin. Eger em bibêjin di roja me ya îroyîn de mijara klasîkan zêdetir bi rêya çapkirina klasîkên Kurdî û wergêranên klasîkên cîhanê bo zimanê Kurdî dikeve rojeva dewrûberên edebîyata Kurdî dê ne darazeke şaş be. Lêbelê vekolînên teorîk û rexneyî yên li ser klasîkên edebîyata Kurdî ku li ser dustûrên klasîkên cîhanê bîn avakirin kêm in. Heta niha bi taybetî li Başûr di çarçoveya edebîyata berawirdî de hin xebat hatine kirin ku bi rastî jî pesnê heq dikin ku ev her du xebatên jêrîn ji bo vê yekê wek nimûne dikarin bîn dayîn: Ezîz Gerdî, *Romeo & Juliet and Mam & Zîn* (weş. Kembrîç) û Azad Tofîq Xeyat, *Nalî & Dantê Wêkçûnêkî Firerehend*, (Înstîtûtî Kelepûrî Kurd, 2017).

## 5. Gelo Klasîkên Edebîyata Kurdî Hene?

Piştî ku me li jorê di çarçoveya edebîyata Rojavayê de mahîyet û dustûrên klasîkan dîyar kir, rewşa klasîkan di nav edebîyatên Îslamî de tesbît kir û rabirdûya klasîkan li nav Kurdan pêşkêş kir, em ê niha werin ser xala heyatî ya vekolînê ku ew jî hebûn yan jî nebûna klasîkên edebîyata Kurdî ye. Bi rastî jî di vê mijarê de tibabek pirs zihnê mirovî mijûl dikin: Gelo klasîkên edebîyata Kurdî hene? Gelo di edebîyata Kurdî de jî hin berhemên ku bikarin bikevin nav klasîkên cîhanê hene? Gelo ji alîyê klasîkan ve rewşa edebîyata Kurdî li hemberî edebîyatên Erebbî, Farisî û Tirkî ku hem cîranên edebîyata Kurdî ne hem jî digel Kurdî di hewzeya edebîyata Îslamî de cih digirin çawa ye? Gelo mirov dikare xişteyêke klasîkên edebîyata Kurdî pêşkêşî edebîyatvan û xwendekarên edebîyata Kurdî bike?



Bi bawerîya me di vê mijarê de tişta ku berî her tiştî bê gotin ev e: Eger edebîyata ku di peywenda klasîkên cîhanê de behsa wê tê kirin tarîxeke xwe, qonaxên xwe, tradîsyoneke xwe, bizavên xwe, cureyên xwe, estetîkeke xwe û hwd. hebe bi awayekî siruştî serhostayên xwe yên edebî û berhemên xwe yên şakar jî dê hebin. Di biwara edebîyata Kurdî de tiştek heye ku qet ne cihê nîqaşê ye: Edebîyata Kurdî edebîyateke xwedî tarîx, qonax, tradîsyon, bizav, cure, estetîk û hwd. ye. Bêguman eger edebîyata Kurdî ji van alîyan ve bi edebîyatên milletên di re bê muqayesekirin dê ji hin alîyan ve ji hinan baştir, ji hin alîyan ve jî ji hinan kêmtir be. Lêbelê ya girîng ew e ku edebîyata Kurdî bi hemû yeke û taybetmendiyên xwe yên navborî, digel ku ji ber sedemên curbicur hêj di bazara edebî ya cîhanî de tam nehatîye naskirin jî, di nav edebîyatên cîhanê yên serekî de cihekî xwe heye. Loma di edebîyata Kurdî ya xwedî rabirdûyeke dirêj de, wek edebîyatên di, hebûna hin serhostayên edebîyatê tişteki gelekî asayî ye. Bi heman rengî di edebîyata Kurdî de jî, wek edebîyatên di, şakarine ku li hemberî zeman mayînde mabin û tradîsyonek ava kiribin jî dê hebin. Qet nebe di çarçoveya edebîyata millî de kesayet û berhemên wê yên ku wesfê klasîkê heq dikin gelek in.

Eger klasîkên edebîyata Kurdî yên millî hebin bi awayekî siruştî senifandîna wan û amadekirina xiştayên pêşnumayî jî tişteki asayî ye. Lewra mahîyeta klasîkê ya elastîkî rê li ber me vedike ku em hin berhemên edebîyata Kurdî wek klasîkên asta yekem û hin berhemên di jî wek klasîkên asta duyem li qelem bidin. Ji aliyê teorîk ve klasîk di çarçoveya hîyerarşiyekê de dikarin li bin hev bînin rîzkirin û berevajîyê kanonê, berhemên ne klasîk wek berhemên bînxir nayên qebûlîkirin. Dikare bê gotin ku hemû berhemên edebîyata klasîk, bi şertê ku hilgirên krîterên esxerî bin, qîmetekî xwe yê klasîkbûnê hene. Jixwe di berhemên tarîxên edebîyatê de senifandîna helbestvanan wek helbestvanên pileye yekem û yên pileya duyem rêbazeke berbelav e ku ev yek di berhemên tarîxa edebîyata Kurdî de jî tê dîtin. Di esasê xwe de di van berheman de tişta ku tê kirin senifandîna klasîkên edebîyatên millî ye.

Eger em bi çavê krîterên klasîkên cîhanê li klasîkên edebîyata Kurdî yên millî binêrin gelo dê rewşeke çawa derkeve meydanê? Çawa ku li jorê hatibû gotin, geşedana edebîyatên Erebî û Farsî bi awayekî giştî beramberî geşedaneke hizrî, sîyasî û civakî ya şaristanîya Îslamê, lêbelê ya Kurdî beramberî lawazî û paşveçûna vê şaristanîyê tê. Loma tişteki siruştî ye ku edebîyata Kurdî di mijara klasîkan de ne di asta edebîyatên Erebî û Farsî de be. Ji aliyekî di ve, çawa ku li jorê hatibû gotin, di roja me de di çarçoveya edebîyata cîhanê de berhemên edebîyata Tirkî wek klasîk nayên qebûlîkirin. Gelo li cihekî ku hebûna klasîkên edebîyata Tirkî bûbe cihê nîqaşê em ê bikarin behsa klasîkên edebîyata Kurdî bikin? Bi bawerîya me eger edebîyateke wek edebîyata Tirkîya Osmanî ku bi qasî şeş sedeyan di coxrafyayeke fireh de li ser pîyan maye klasîkên cîhanê dernexisti-

bin, ev yek mesajê dide me: Derxistina klasîkên cîhanê ji hêza desthilatdarîyê, dirêjbûna zamanî û firehîya mekanî wêdetir bi nirx û pîvanên edebî ve girêdayî ye. Loma divê mijar di çarçoveya edebîbûnê de bê nirxandin.

Me di beşa yekem a vê vekolînê de behsa krîterên ku berhemekê dikin klasîkeke cîhanê kiribû. Li vê derê em dixwazin di çarçoveya van krîteran de nirxandinekê li ser edebîyata Kurdî bikin û ji bo destnîşankirina cihê edebîyata Kurdî di nav edebîyata cîhanê, bi taybetî jî di nav edebîyatên Îslamî de bikevin nav hewldanekê. Dema mirov ji pencereya krîteran ve li edebîyata Kurdî binêre dê bê dîtîna ku dêrînîbûn, aîdiyeta çîneke bilind û derketina ji nav şaristanîyeke mezin/serdemeke zêrîn ne di nav de hemû krîterên dî (şîyana nivîskarî, asta bilind a hunerî, gerdûnîbûn, mayîndebûn, sazîkirina tradîsyoneke edebî, xwendin û çapîkirin, wergirtina tam û lezzeta derûnî) bi nivîskar û berhema edebî bixwe ve girêdayî ne. Li gor ku edebîyata Kurdî tarîxeke xwe ya edebîyatê ya xwedî nivîskar û metnên edebî heye hebûna van taybetîyan jî tişteki asayî ye. Di esasê xwe de dêrînîbûn jî bi tarîxa edebîyatê re pêwendîdar e. Madem tarîxeke edebîyata Kurdî ya kevin heye di wê dereceyê de berhemên wê yên dêrîn jî hene. Çawa ku di nimûneyên Baba Tahir û Mela Perîşan de jî tê dîtîna edebîyata Kurdî ji aliyê dêrînîyê ve gelekî avantaj e. Hetta ji vî aliyê ve tenê edebîyata Kurmancî hevsengî edebîyatên Rojavayê ye. Loma eger dêrînîbûn wesfeke bingehîn a klasîkê be naxwe edebîyata Kurdî xwedî berhemên klasîk e jî. Çîna bilind taybetîyeke civaka Romayê ye û jixwe hebûna çîneke bi vî rengî di edebîyata Kurdî de ne mewzûbehs e. Lêbelê ev heye ku nûnerên edebîyata Kurdî ya klasîk ên ku di medreseyan de perwerdeyeke bilind didîtin di nav xwe de wek çîneke bilind a perwerdebûyî dikarin bèn qebûlîkin.

Di nav van krîteran de ya herî hessas hebûna şaristanîyeke mezin/serdemeke zêrîn e ku ew rasterast bi tarîxa sîyasî ve girêdayî ye. Bi rastî jî edebîyata Kurdî di tarîxa xwe de di asta edebîyatên Erebi, Farişî û Tirkî de nebûye edebîyateke xwedî serdemeke zêrîn. Bêguman hebûna desthilateke bihêz û domdar dê jimara helbestvanan, berhemdarîyê û çalakîyên edebî zêdetir bike. Lewra di desthilatdarîyên serdemên navîn ên patrîmonyal de helbestvanan ji ber piştgirîya maddî û xweparastina ji metirsîyên jîyanê berê xwe didan qesrên desthilatdaran, desthilatdaran jî ji bo ku pesnê wan bê dayîn û navê wan li dinyayê belav bibe piştgirî didan helbestvanan. Bivênevê di nav vê sîtemê de hejmara helbestvanan û berhemên edebî zêde dibûn. Ji vî aliyê ve hebûna cudahîyekê di navbera edebîyata Kurdî û edebîyatên Erebi, Farişî û Tirkî de tişteki asayî ye. Lêbelê nebûna sîstemeke bi vî rengî di nav edebîyata Kurdî de aliyekî xwe yê erênî jî heye: Ji ber nebûna vê sîtemê rengvedanên nerênî yên seltenet û desthilatdarîyê li ser edebîyata Kurdî çêbûne. Helbestvanên Kurdan hêz û şîyana xwe ya edebî bi nivîsîna medhîye û mersîyeyên desthilatdaran re xerc nekirine. Çawa tê zanîn

helbestên bi vî terzî di her sê edebîyatên Îslamî yên navborî de gelek in. Mesela di edebîyata Tirkî ya Osmanî de di wê dereceyê de metnên edebî yên ku derheqê Sultan Selim û Sultan Suleyman de hatine nivîsîn hene ku koma yekem bi navê “selimname” û ya duyem jî bi navê “suleymanname”yê cureyên edebî saz kirine. Dîsa di edebîyata Osmanî de gelek cureyên edebî hene ku tenê bi rêwresmên îdareya dewletê re pêwendîdar in (xezewatname, xezaname, sefername, sefaretname, sîyasetname, sûrîyye, sûrname, culûsiye, fethîye, fetihname, û zefername).<sup>60</sup> Eger di çarçoveya dustûrên klasîzmê de nirxandinek bê kirin, berhemên ku di van mijaran de hatine nivîsîn wek berhemên klasîk ên cîhanê nayên qebûl kirin. Lewra milletên bîyanî ne mecbûr in ji coşa millî û çanda xwemalî ya miletekî heman tam û lezzetê wergerin. Li vê derê tişta ku em dixwazin bibêjin ew e ku qewareya zêde ya metnên edebî yên ku di encama desthilatdarîyê de derketine meydana û zêdebûna helbestvanên vî terzî her dem di asta cîhanî ne meqbûl in. Rast e di edebîyata Kurdî de metnên bi vî rengî pir kêman in. Lêbelê ev tunebûn ji aliyê krîterên gerdûnî ên klasîzmê ve kêmasîyekê naîne ser edebîyata Kurdî. Bêguman di edebîyata Kurdî de jî mijarên dînî yên ku tenê xîtabî Misilmanan dikin hene (wek mewlûdnameyan), lêbelê em dixwazin bibêjin ku nebûna mijarên ku rasterast bi desthilatdarîyê ve girêdayî ne kêmasîyekê naîne ser edebîyata Kurdî.

Esasen dema mirov li tarîxa edebîyata cîhanê binêre dê bê dîtîna ku desthilatdarîyêke bihêz (seltenet, împeratori) ji bo asteke bilind a edebî her dem nebûye şertekî jê neger. Helbesta Erebi ya berî Îslamîyetê ku jêdera edebîyata klasîk a Erebi, Farisî û milletên di yên Misilman e ji bo vê yekê wek nimûne dikare bê dayîn. Loma lokal be jî û di çarçoveya bajar-dewletan de be jî hebûna desthilatdarîyêke ku bikare xwe ji êriş û metirsîyên derve biparêze û bi taybetî sazîyên xwe yên perwerdeyê ava bike ji bo derketina edebîyatekê zemîneke guncaw saz dike. Eger ev zemîn hebe û helbestvan jî xwedî qabiliyet be ji bo derketina edebîyateke bihêz tu astengî namîne ku Melayê Cizîrî û gelek edebîyatvanên di yên Kurdan nimûneyên şênber a vê diyardeyê ye.

Ji aliyekî di ve di encama nebûna desthilatdarîyêke yekgirtî de di edebîyata Kurdî de zimanekî edebî yê standart jî ava nebûye. Pirdiyalektî taybetîyêke bingehîn a edebîyata Kurdî ye. Ji ber vî jî li şûna ku hemû potansiyela edebî ya Kurdan bo zimanekî standart û yekgirtî bê xerckirin ev potansiyel li nav diyalektên cuda belawela bûye û di encamê de edebîyata Kurdî ji avantajên zimanekî standart bêpar maye. Lêbelê ev heye ku nebûna zimanekî standart di heman demê de rê li ber statîkbûn û monotonîya edebîyatê jî girtîye. Dema em li edebîyata Osmanî ya ku demeke dirêj di coxrafyayêke berfireh de li ser pîyan maye dinêrin, em dibînin ku ew edebîyat bi piranî li ser heman dustûrên poetîk û estetîkê ava bûye. Bizavên cuda yên wek Sebkê Iraqî û Sebkê Hindî jî li ser heman poetîka

60 - Ji bo van cureyên edebîyata Osmanî bnr. Rıdvan Canım, *Divan Edebiyatında Türler*, Grafiker, Ankara 2014.



û retorîka Îranê meşîne. Lêbelê di edebîyata Kurdî de di encama pirdiyalektîyê de rewşeke cuda heye. Bi taybetî edebîyata Kurdîya Goranî ya sahaya Îranê di mijarên poetîk û estetik de ji standarta edebîyata Îslamî ku di edebîyatên Erebi, Farisî, Tirkî û Kurdîya Kurmancî, Soranî û Zazakî de hatîye şopandin pir cuda ye. Herweha di Kurdîya Goranî de hebûna dastanên tarîxî, epîk û mîtolojîk jî her di vê çarçoveyê de ye. Jêdera van taybetmendîyên edebîyata Kurdîya Goranî edebîyata Kurdî ya xwemalî ye. Wisa dixuye ku eger di nav Kurdan tevan de zimanekî edebî yê standart hebûya di edebîyata Kurdî de dê ev xweserîya navborî jî têk biçûya. Avantajeke di ya pirdiyalektîyê jî di her diyalektekê de bi berhemêke damezirîner vejandina edebîyata wê diyalektê ye. Çawa ku di beşa yekem a vekolînê de hatibû diyarkirin berhemên ku di serdemên guherîn û nûjenîyê de bi zimanekî nû dihatin nivîsîn dibûn berhemên klasîk.

Wek encam; ji bo ku klasîkên millî yên edebîyata Kurdî payeya klasîkên cîhanê bi dest bixin çawa ku dezavantajên edebîyata Kurdî hene gelek avantajên wê jî hene. Li vê derê em dixwazin di çarçoveya krîterên klasîkên cîhanê de xişteyekê bo berhemên asta yekem ên edebîyata Kurdî ya klasîk pêşniyaz bikin û ji bo destnîşankirina van berheman wek klasîkên cîhanî bikevin nav hewldanekê. Bêguman ji bo vê jî divê mirov serî li krîterên ku berhemêke dikin klasîk bide ku di destpêka vekolînê de bi berfirehî li ser wan hatibû rawestan. Lê ji bo ku em berhemêke bineqînin hilgirtina hemû krîteran ne lazim e û ne pêkan e jî. Dibe ku alîyekî berhemêke ewqas bihêz be ku ew alî di dayîna wesfê klasîkê de roleke mezin bilîze. Di vê xişteyê de di nav berhemên edebîyata Kurdî de yên ku herî zêde krîteran hildigirin dê bîn hilbijartin. Bi taybetî divê bê gotin ku em ê vê hilbijartinê di çarçoveya hemû diyalektên edebî yên Kurdî de bikin. Eger di çarçoveya diyalektekê tenê de be bêguman xişte dê biguhere. Armanca me ew e ku di çarçoveya edebîyata Kurdî ya klasîk tevî de xişteya berhemên ku pêşaniyê heq dikin derkeve meydana. Li gor me berhemên ku di vê xişteyê de cih digirin ne tenê di çarçoveya edebîyata Kurdî de di çarçoveya edebîyata cîhanê de jî namzed in ku wek klasîk bîn qebûlkirin. Di esasê xwe de em li vê derê ji bo wê tesnîfa ku Celadet bi hêvîya vekoleran hiştibû dikevin nav hewldanekê. Lêbelê ev heye ku em di vê xişteyê de tenê klasîkên pileya yekem didin û behsa yên pileya duyem nakin û wê dihêlin bo xebatên paşerojê. Di çarçoveya krîterên navborî de ji berhemên edebîyata Kurdî ya klasîk yên ku wek namzedên klasîkên cîhanê derdikevin pêş ev in:

- |  |                    |
|--|--------------------|
| » Dubeytîyên Baba Tahir (937-1010)     | : Kurdiya Lorî     |
| » Perîşannameya Mela Perîşanê Dînewerî | : Kurdiya Goranî   |
| » Dîwana Mela (1567-1640)              | : Kurdiya Kurmancî |
| » Mem û Zîna Xanî (1651-1709)          | : Kurdiya Kurmancî |
| » Dîwana Nalî (1800-1877)              | : Kurdiya Soranî   |

Ji ber ku di vê vekolînê de ne pêkan e em ê analîza van berhemana ji aliyê krîterên klasîkbûnê ve taloqî paşerojê bikin. Dîsa divê di paşerojê de ji bo amadekirina xîşteyê gîştî ya edebîyata Kurdî ji bo her dîyalektekê berhemên asta yekem û yên asta duyem bîn tesbîtkirin û di çarçoveya hemû xîşteyan de xîşteyê gîştî ya edebîyata Kurdî bê amadekirin.

## 6. Veguhestina Klasîkên Kurdî bo Bazara Cîhanê

Bêguman edebîyata Kurdî ya klasîk digel klasîkên xwe êdî malê tarîxê ye. Em nikarin li mîrasa heyî tiştêkî zêde bikin û ji nû ve klasîkan îcad bikin, lêbelê qet nebe em dikarin ji bo danasîna klasîkên edebîyata Kurdî û veguhestina wan bo bazara cîhanê nexşerêyêkê amade bikin û di wê rêyê de bi baldarî bimeşin. Di vê nexşerêyê de qonaxa yekem û ya herî girîng wergêran e. Çawa tê zanîn klasîkên cîhanê di avakirina edebîyata cîhanê de roleke girîng dilîzin. Ji bo ku ev berhemê vê rola xwe bilîzin, yan divê kesên bîyanî fêrî zimanê berhemê bibin û berhemê ji zimanê wê yê resen bixwînin ku ev rêbaz zêde ne berbelav e, yan jî divê berhem bi rêya wergêranê bo zimanên bîyanî bê veguhestin ku rêbaza herî zêde berbelav ev e. Dikare bê gotin ku berhemek çiqas bo zimanên bîyanî bê wergêran û çî bi zimanê resen be çî bi zimanê wergêranê be çiqas zêde bê çapkirin ew berhem di wê astê de dibe berhemek klasîk a cîhanî. Guman tune ku di nîşandana nîrxê edebî yê wê berhemê de ev ne nîşaneyekê tekane be jî nîşaneyekê pir girîng e. Herweha di tesbîtkirina klasîkên cîhanê de herî zêde krîtera wergêranê li ber çavan tê girtin. Lêbelê digel vê jî hin berhemên ku qet wergêrana wan nehatîye kirin û navên wan nehatîye bihîstin jî ji aliyê taybetmendiyên xwe ve dikarin wek berhemên klasîk bîn nirxandin. Ji bo ku berhemên bi vî rengî bikevin nav bazara cîhanê, çare nîne, divê wergêrana wan bê kirin. Berhemên ku taybetmendiyên klasîkan hilgirin heta bi rêya wergêranê bo zimanên cîhanê neyên veguhestin ew mehkûm in ku wek klasîkên millî û xwemalî bimînin.

Çawa tê zanîn heta niha wergêrana hin klasîkên Kurdî bo zimanên bîyanî hatîye encamdan. Ji van klasîkan *Dubeytîyên* Baba Tahir bo Frensî, Îngilîzî, Almanî, Rûsî, Îtalî, Çekî, Tirkî, Ermenî, Urdu û Gurcî; Mem û Zîna Xanî bo Tirkî, Erebî, Farsî, Azerî, Rûsî, Elmanî, Îngilîzî, Frensî û Flemenkî, dîwana Melayê Cizîrî jî bo Rûsî, Erebî û Tirkî hatîye wergêran. Lêbelê cihê gumanê ye ku ev wergêran ji refên pirtûkxane û akademîsyenan derbasî nav bazara edebîyatê bûbin. Ji aliyêkî di ve gelek ji van wergêranan tenê di çarçoveya zimanên wergêranê de roleke bi sînor dilîzin. Loma di dinyaya me ya hevçax de ji bo bidestxistina mefaya azamî ya ku ji wergêranê tê hêvîkirin ji aliyê pisporan ve li ser girîngîya wergêranên bo zimanê Ingilîzî gelekî tê rawestan. Li vê derê em dixwazin guh bidin tesbîtên girîng ên Erkman ku di vê babetê de îfade dike:

“Herçiqas ji ber sedemên wek cîrantî, kolonyalîzm û cihgirtina di nav dewletên ku di asta geşedanê de ne, zêdetir tesîra edebiyata Rojavayê li ser edebiyatên milletên di yê cîhanê çê dibe û di navbera wan de danûstandineke yekalî ya di lehê Rojavayê de rû dide jî, êdî di demên dawîn de bi rêya çalakîyên zêde yê wergêranê milletên cîhanê ji edebiyatên hev agahdar dibin. Lê ev heye ku ji ber zêdehiya metnên edebî û zimanên cîhanê cîbicîkirina vekolînên vegir û dîtina cîhanê têvî hema bibêje ne pêkan e.”<sup>61</sup>

Li vê derê Erkman, bi awayekî mafdar, balê dikişîne ser wergêranên ku bo zimanên neberbelav ên dinyaya hevçax tîn kirin. Bi awayekî siruştî, ji ber ku herkes zimanên bi vî rengî nizane, di vê rewşê de tesîra berhemê ya ku tê hêvîkirin bi sînor e. Erkman ji bo çareserîya vê kêşeyê dibêje ku “ji bo metnên aîdê edebiyatên millî di pîyasayên cîhanê de cih bigirin ji bilî wergêrana wan bo Îngilîzî rêyeke di tuneye. Mesela metnên aîdê Çînê yan jî Portekîzê pêşî bi rêya Îngilîzî dikevî bazara cîhanê û piştê bi rêya Îngilîzî wergêrana wan bo Tirkî tê kirin. Bi kurtî Îngilîzî di asta cîhanê de zimanê desthilatdar e.”<sup>62</sup> Erkman herî dawî balê dikişîne ser mijareke di ku ew jî dezgeha weşanê ye: “Herweha biryardayîna li ser berhemên ku dê bîn wergêran jî di bin inhîsara weşanxaneyan de ye.”<sup>63</sup>

Eger em tesbîten Erkman li klasîkên edebiyata Kurdî tetbîq bikin, di roja me de ji bo ku klasîkên Kurdî bikevin bazara cîhanê rêya herî kurt û karîger wergêrana wan bo zimanê Ingilîzî ye. Lêbelê ev jî têrê nake, divê ev wergêran bikarin ji nav weşanxaneyên xwedî prestîj derkevin. Erkman behsa inhîsara weşanxaneyan bike jî, bi bawerîya me eger wergêran bi xebateke baş û şewazeke gerdûnî ya ku di klasîkên cîhanê de tê şopandin bi pêşekî, têbînî, ferheng û wêneyan bê dewlemendkirin (wek wergêrana *Heft Peykerê* ya bo Îtalî ku tesîreke mezin li ser Calvino kiribû) ev inhîsar jî dikare bê şikandin.

Gelo di roja me de di nav edebiyatvan û wergêrên Kurd de ev rola Ingilîzî baş hatîye fêmkirin? Farangis Ghaderi û Clémence Scalbert Yücel di xebata xwe ya ku hêj nû hat weşandin de tam li ser vê babetê rawestîyane û di biwara bersiva wê pirsê de hin encamên balkêş bi dest xistine:

“Endîşeyên wisa bandoreke mezin kirîye li ser hîlbijartin û pêşkeşkirina metnên bi Kurdî. Bi vî rengî, tenê beşeke wêjeyê ya ku bi tama xwînerê Anglophone re lihevhatî xuya dike ji bo wergerandinê tê hîlbijartin û dewlemendiya kevneşopîya klasîk û formên wê yê helbestkî cih nagirin. Ji ber vê yekê, berevajî mupteleya bi nivîsarên xwedî prestîj ên edebî û dîrokî yê çalakîyên wergêranê li Irlandayê (Cronin 1998, 155), di wergêranên wêjeya Kurdî de nivîsên klasîk hema bêje tu-

61 - Fatma Erkman-Akerson, *Edebiyat ve Kuramlar*, İthaki, İst. 2015, r. 40-41.

62 - Erkman-Akerson, h.b., r. 41.

63 - Erkman-Akerson, h.c.



nene. Sedemek din a tunebûna metnên klasîk ji nebûna aktorên akademisyen di warê wergêranê de û kêmbûna xebatên akademîk ên li ser edebîyata klasîk a Kurdî ne li gorî wêjeyên din ên Rojhilata Navîn wek edebîyatên Erebi an Farisî ku pir berfireh hatine vekolan û wergêran. Di rastiyê de, tenha metna klasîk a ku hatiye wergêran, Mem û Zîn, wekî mînakeke neteweperwerîya Kurdî hate rêzkirin û têkilîya wê bi serdema nûjen re di dermetnan (paratext) de hêj bêtir tê tekez kirin. Wêjeya devkî û gelêrî jî bi rengê berbiçav tune ye. Ev bi dîtina Cronin re li hev tê ku zimanek hindîkahî dikare li ser berxwedana sembolîk bisekine û wergêranan bi tekstên çanda bilind re bisînor bike, hemî warên din ên ezmûna mirovî paşguh bike yên ku çandekê saz dikin... Bi armanca ku ji bo xwînerên Ingilîz guncawtir bin meyla wergêrana metnên modern ên nû ku ji teşe û sembolîzma helbesta klasîk dûr in tê kirin.”<sup>64</sup>

Çawa tê dîtîn di roja me de wergêrana edebîyata Kurdî ya klasîk bo zimanê Ingilîzî ne di asteke baş û dilxweşker de ye. Pisporên edebîyata Kurdî ya klasîk kêma in û dema wergêrên Kurdî ji bo wergêrana Ingilîzî metnên edebî yên Kurdî hildibijêrin xwe bi taybetî ji metnên edebîyata klasîk dûr dixin. Loma di vê babetê kêşedar de tiştên ku bînin kirin gelek in. Berî her tiştî divê berhemên ku heta niha wergêrana wan nehatine kirin bi şewazeke taybet bo Ingilîzî bînin veguhestin. Berhemên ku wergêranên wan hatine kirin jî divê bi awayekî xweştir ji nû ve bînin amadekirin (*Dubeytîyên Baba Tahir û Mem û Zîna Xanî*). Herweha di xebatên antolojîk de jî divê nimûneyên baş ên helbesta klasîk bînin bicihkirin. Bi bawerîya me eger antolojîke helbestên bijarte digel têbînîyên pêdivî di Ingilîzî de bê amadekirin dê bala pisporên helbesta klasîk bikişîne. Bêguman ji bo ku di van karan de serkeftinek bê bîdestxistin divê pisporên edebîyata Kurdî ya klasîk roleke aktîf bilîzin.

Di nexşerêya veguhestina klasîkên Kurdî bo bazara cîhanê de qonaxe di ya serrekî jî vekolînên akademîk ên li ser klasîkên Kurdî ne. Bi taybetî eger ev vekolîn bi zimanê Ingilîzî û bi rêbazên edebîyata berawirdî bînin kirin mirov dê zûtir bigihîje bazara cîhanê. Heta niha kêma be jî hin klasîkên Kurdî bi hin klasîkên cîhanê re hatine berawirdkirin ku xebata Ezîz Gerdî ya bi navê *Romeo & Juliet and Mam & Zîn* (bi Ingilîzî) û ya Azad Toñiq Xeyat ya bi navê *Nalî & Dantê Wêkûnêkî Firerhend* (bi Kurdî) du nimûneyên girîng in. Bêguman ji bo ku mirov bikare van vekolînan bike divê mirov hem jî teorî, termînolojî û lîteratura klasîzmê haydar be hem jî xweserî û taybetmendîyên klasîkên Rojavayê û Rojhilatê nas bike. Ji bo vê jî divê mirov krîtrên ku Vergilius, Shakspeare, Malherbe, Goethe, Se’î, Hafîz, Mewlana û Nîzamî dikin klasîkên cîhanê bizane. Dema mirov xwedîyê van zanarîyan be mirov dê fêma bike ka ew krîter heta bi çi astê, bo nimûne, di dîwana

64 - Farangis Ghaderi & Clémence Scalbert Yücel (2021): An etat présent of the kurdish literature in english translation, The Translator, <https://www.tandfonline.com/doi/full/10.1080/13556509.2021.1872196>, r. 10.

Mela yan jî *Mem û Zîna* Xanî de cih digirin. Eger klasîkên Kurdî bi vê şewazê di bazara cihanê de bèn nasandin bêguman dê reweşeke dilxweşker bê bidestxistin.

Bêguman ji bo ku Kurd bikarin van qonaxan derbas bikin û bigihîjin bazara cihanê divê putepêdaneke taybet bo edebîyata Kurdî ya klasîk nîşan bidin. Divê edebîyatvanên Kurd formasyoneke baş û xwendekarên edebîyata Kurdî perwerdeyeke baş a zanista edebîyata klasîk wergirin. Çawa ku Jan Kott bûbû hevçaxê Shakespeareî (*Shakespeare our Contemporary*) divê vekolerên edebîyata klasîk jî bibin hevçaxê Melayê Cizîrî.

### Encam

Hemû tesbît û nîqaşên ku di vê vekolînê de hatine kirin me digihînin wê encamê ku edebîyata Kurdî ya klasîk bi potansiyela xwe ya ku ji hezar sal berê bi dîyalekt, serdem, qonax, navend û bizavên edebî yên curbicur gihîştîye roja me ji serhostayên xwe yên edebî û berhemên xwe yên şakar jî ne bêbehre ye. Lêbelê ji ber ku akademîya Kurdî ev potansiyel heta niha bi awayekî zanistî û metodolojîk dernexistîye meydanê îmkana danasîna qumaşê xwe yê binirx di bazara cihanê de bi dest nexistîye. Îro firotîna wî qumaşî di dezgehên herî biprestîj ên cihanê de berpirsiyarîyeke mezin e ku dikeve ser milê me. Em di wê bawerîyê de ne ku eger em vê berpirsiyarîyê binin cih rojekê bi destê Goetheyekî modern alaya dîwana Melayê Cizîrî û bi destê Calvinoyekî nû jî alaya *Mem û Zîna* Xanî li banê gerdûnê dê bê çikandin. Esas wê demê utupyaya Xanî dê bibe rastîyek û ruhê Xanî jî û pêşîneyên wî yên Kurmanc jî û hempîşeyên wî yên Goran, Soran û Zaza jî dê kêfxweş bibe. Dîsa wê demê li xîştaya temsîlî ya klasîkên her miletekî ya ku di destpêka vê vekolînê de hatibû pêşkêşkirin klasîkekî wek Melayê Cizîrî jî dê bê zêdekirin.

Di vê vekolînê de hewl hat dayîn ku piştî gava ku Celadet Alî Bedirxan berî niha bi heştê salî di mijara klasîkan de avêtibû gaveke nû bê avêtin. Bêguman meşa li pey şopa vê mijarê li vê derê dê neqede. Ji ber ku di encama vê meşê de fêkîyek bê xwarin divê gelek gavên dî bèn avêtin. Li ser navê xwe, eger bibe nesîb, di vekolîneke/vekolînine dî de divê analîza her pênc klasîkên ku li vê derê ji alîyê me ve hatine hîlbijartin bê kirin. Dibe ku piştî jî klasîkên edebîyata Kurdî bèn senifandin û di çarçoveya dîyalektên edebî yên Kurdî de xîştayên pêşnumayî bèn amadekirin.

## Jêder

### Jêderên Çapkiri:

- Adak, Abdurrahman , *Destpêka Edebîyata Kurdi ya Klasik*, Nûbihar, İstanbul, 2014.
- Anar, Turgay, Türk Edebiyatında Edebiyat Kanonu, FSM İlmi Araştırmalar ve İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi, 1 (2013) Bihar.
- Azîzan, Herekol, “Klasikên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin”, *Hawar*, weş. Nûdem, Stokolm 1998.
- Berwarî, Hêvî *Rêbazên Edebî*, Weşanên Êketiya Nivîserên Kurd (çapa yekem), Dihok 2010.
- Beuve, Sainte, “Klâsik Nedir”, Pazartesi Konuşmaları I, (wer. Fehmi Baldaş), MEB Yayınları, çapa duyem, İstanbul 1990, r. 315-336.
- Bloom, Harold, *Batî Kanonu*, wer. Çiğdem Pala Mull, İthaki, İst. 2014.
- Bozarlan, M. Emîn, “Pêşgotin”, *Ehmedê Xani, Mem û Zîn*, Gün yay., İst. 1968.
- Brook, Peter, “Pêşgotin”, *Jan Kott Çağdaşımız Shakespeare*, Mitos Boyut Yayınları, wer. Teoman Güney, İst. 1999.
- Calvino, Italo, *Klasikleri Niçin Okunmalı?*, wer. Kemal Atakay, YKY Yayınları, İstanbul 2008.
- Canım, Rıdvan, *Divan Edebiyatında Türler*, Grafiker, Ankara 2014.
- Çetindağ, Yusuf, “Şark Klasikleri ve Özellikleri”, *Dergâh*, b. 16, j. 191, 2006, r. 9-15.
- Doğan, D. Mehmet, *Neden Klasiklerimiz Yok?*, Yazar Yay. İst. 2016.
- Durmuş, Tuba İsen, “Türk Edebiyatında Klasik Algısı Üzerine Düşünceler”, *Millî Folklor*, 2011, sal 23, j. 90.
- Eliot, T. S., *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, wer. Sevim Kantarcıoğlu, Paradigma, İstanbul 2007.
- Erkman-Akerson, Fatma, *Edebiyat ve Kuramlar*, İthaki, İst. 2015.
- Ferhadî, Ebdulxefûr Rewan, “Se Qern û Nîmê Se’ dişînâsî der Xerb ez Rûyê Tercumehayê Gulistan û Bostan”, *Zikrê Cemîlê Se’ dî*, Tehran 1364, II, r. 175-196.
- Goethe, Johann Wolfgang, *Batî Doğu Divanı*, wer. Gürsel Aytaç, Hece Yayınları, İst. 2021.
- Hemze [yê Miksî], “Dîbace”, *Ehmedê Xani Mem û Zîn*, Necm-i İstikbal Matbaası, İstanbul 1335 (1919).
- Kaplan, Ramazan. *Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*. Ankara: Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, 1998.
- Midhat, Ahmed, “Müsabaka-i Kalemîyye İkrâm-ı Aklam”, *Ramazan Kaplan, Klasikler Tartışması (Başlangıç Dönemi)*, Atatürk Kültür Merkezi Yayınları, Ankara 1998.



Pîrbal, Ferhad, *Rêbaze Edebiyekan*, Dezgay Wergêran, Hewlêr 2006.

Saadalla, Salah, "Preface", *Ahmed Khani, Mem Zin*, wer. Salah Saadalla, Avesta, Istanbul, 2008.

The Editors of Encyclopaedia Britannica, "Classical literature", Encyclopaedia Britannica, <https://www.britannica.com/art/lyric> (21.03.2021).

Yavuz, Hilmi, "Bizim Klasiğimiz Var mı?", *Denemeler*, Boyut Yay., İstanbul 1996, r. 30-33.

Zivingî, Mela Ehmedê, *el-'Iqdu'l-Cewherî fi Şerhî Dîwanî eş-Şeyxi'l-Cezerî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

### **Jêderên Dijîtal:**

Ghaderi, Farangis & Yücel, Clémence Scalbert, "An etat présent of the kurdish literature in english translation", *The Translator*, 2021, <https://www.tandfonline.com/doi/full/10.1080/13556509.2021.1872196>

Karahan, Abdülkadir, "Fuzûlî", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/fuzuli> (29.03.2021).

O'Runeer, Nedim Doğan, Nicolas Boileau ve Yazma Sanatı Adlı Eseri Üzerine, 2019, [https://www.academia.edu/40789142/Nicolas\\_Boileau\\_ve\\_Yazma\\_Sanatı\\_Adlı\\_Eseri\\_Üzerine](https://www.academia.edu/40789142/Nicolas_Boileau_ve_Yazma_Sanatı_Adlı_Eseri_Üzerine), (02.04.2021).

Unat, Yavuz, "Ömer Hayyâm", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/omer-hayyam#1> (28.03.2021).

Yazıcı, Tahsin, "Gülistân", TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/gulistan> (29.03.2021).

<http://www.dictionnaire-academie.fr/article/A9C2532> (02.04.2021)